

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 86
Çiriya Paşin
1988
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

Armanc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 86
November
1988
Price: 10 Skr.
2.5 DM

Li hefsên Tirkîyê û Kurdistanê de:

Girtî bi grewên birçîbûnê li berxwe didin

- * Ji bona protestokirina Beyannama 1'ê Tebaxê û ji bona başkirina rewşa hefsan, 2000 girtî ketin grewên birçîbûnê
- * Li hefsa leşkeriya No:1'ê a Diyarbekrê piştî 44 rojên grewa birçîbûnê îdara hefsê hin daxwazên girtiyan qebûl kir
- * Diya girtiyekî siyasî ji bo rewşa hefsan protesto bike, li Stenbolê teşebus kir ku xwe bişewitîne.



Li Stenbolê polisê êriş bir ser kesên ku ji bo piştgiriya berxwedana hefsiyên, ketibûn grewa birçîbûnê.

Ji bona protestokirina Beyannama 1'ê Tebaxê ku ew beyanname di hefsan de cilên bi yekbabet mecbûr dîke û ji bona parastina mafên xwe û başkirina rewşa hefsan; girtiyên hefsên Diyarbekrê, Eskîşehrê, Stenbolê, Aydinê, Nazîlyê, Ceyhanê, Amasyayê, Erzincanê, Edenê, Bûrsayê, Meletyê

û hin bajarên din dest bi grewa birçîbûnê kirin.

Li dervayî hefsan jî, ji bona piştgiriya girtiyan; grewên birçîbûnê, meş û protestoyên cûda cûda çêbûn. Li Enqerê, Stenbolê, Edenê, İzmirê bi sedan kes ketin grewên birçîbûnê, tehebên unîversîte meş çêkirin û ji Meclîsa Tir-

kiyê re telgirafên protestoyê hatin şiyandin.

Li Diyarbekrê dora 500 kesî li ber bîna SHP'ê ketin grewa birçîbûnê. Di nava van kesan de yê zêde pîrek bûn. Piştî 25 rojên grewê, Salîhe Şener, Sebriye Sozer û

Dûmahîk r. 11

Kurdistana Iraqê:

Çalakiyên pêşmerge di nav bajarên de geş dibe

Ji aliyekî de rejîma xwînmij a Baas bi çekên kîmyayî hovîtiya xwe dom dîke, ji aliyê din de jî digel hemû wehşet û tedbîrsten-

dinên rejîma Seddam, hêzên pêşmerge nemaze di nav û dor û berên bajarên de derbên giran li dijmin dixe.

Her roj nûçeyek ji Kurdistana Iraqê tê, mîrxasî û çalakiya pêşmerge qehreman dide diyarkirin. Belavoka Cepha Kurdistana Iraqê ku di 22'ê Çiriya Pêşin de hatiye belavkirin çend ji van çalakiyan dide diyarkirin.

Di roja 9'ê Çiriya Pêşin de mufrezek liqê 3'an a PDK-I ku gir-

êdayî Cepha Kurdistana Iraqê faalîyet nîşan dide, digel hemû tedbîrên dijmin ku li dor bajarê Kerkûkê sitendiye, ket nav bajarê, êriş bir ser erebeka Daira Ewlekarî ya Iraqê, bînbaşî Muhammed Meter û Yûzbaşî Sad kuştin.

Roja 11'ê Çiriya Pêşin, dîsa mufrezek liqê 3'an li ser rîya

Kerkûk-Tekrît'ê kemîn danî. Pêşmerge erebek îstixbaratê sekînanî û erebê gulebaran kirin. Serokê îstixbarata Kerkûkê tevî teymenekî mir.

Li gor hin nûçeyên ketine destên me, roja 11'ê Çiriya Pêşin hê-

Dûmahîk r. 11

TEVGER

"Ji bo rizgarbûna gelê Kurd em ala têkoşînê bilind kin!"

Komîta Giştî ya Tevgera Rizgariya Kurdistan (TEVGER) di 4-6'ê Çiriya Paşin de civiya. Civîn, li ser kar û barên TEVGER'ê yê roja damezirandina wê ve heta nuha rawestiya, li ser rapora Komîta Birêvebir mutalaa kir.

Komîta Giştî li ser meselên di rojeva TEVGER'ê de ne şirovekir û biryarên girîng girt. Ji van biryarên yek jî ew bû ku li nav welat karê rêxistinî kûr bibe û bê firehê kirin. Civînê siyaseta rojane ya li ber TEVGER'ê ye tesbît kir. TEVGER'ê, piştî civînê jî bi belavokê raya giştî haydar kir.

Belavok li ser aşitiya dinê, helkirina şerên herêmî radiweste û aligiriya aşitiyê dîke. Bi firehî li ser şerrawestandina Îran-Iraqê û piştî wê, êrişên rejîma xwînmij a Iraqê ya li ser Kurdistanê disekine, êrişên rejîma hov a Iraqê rûreş dîke. Bangî rayagiştî ya dinê dîke ku dengê xwe li hember sûcên li dij-mirovayeti yê Iraqê bilind bike û piştgiriya gelên Kurd ku ji bo mafên xwe yê adil şer dîke, bike. Li ser van bûyeran rexne li siyaseta bédengî ya welatên sosyalîst digre.

Di warên aborî, mafên însanî û mesela Kurdan de siyaseta cûnta faşîst radixe ber çavan. Ji bo têkoşîna daxwazên acil bangî kedkarên Kurd û Tirkan dîke. Ev daxwaz ev in:

"Bila zîndan vala bibin, azadî ji bo girtiyên siyasî!, Dawî li îşkence, tade û kirinên xirab bê!, Bila cezayê îdamê rabe!, Dawî li terora ser çapemeniya sosyalîst û welatparêz bê!, Na ji qanûnên 141, 142, 163 û yê din ên ne demokratîk re!, Bi temamî û bê şert ji herkesî re azadiya rêxistinî!, Bila tadeyîyên li ser ziman û çanda Kurd dawî bê!, Bila walîtiya herêmî li Kurdistanê rabe, dawî li îdareya awarte bê! Bila mîlîtiya li gundan rabe!, Na ji 'Parastina Teritoryal' û karên wekî wê yê mîlîtarîst re!, Em ji zema re bêjin bes!, Na ji siyaseta teror û birçîbûnê ya Evren-Ozal re!"

Şeva piştgiriya Medya Guneşî bi serfirazî derbas bû

Di 13'ê Çiriya Paşin de li Stockholmê li Medborgarhusetê ji alî Komîta Piştgiriya Medya Guneşî ve şevê hat organîzekirin. Di şevê de nêzî hezar kesî hazir bûn û partî, rêxistin, komel û redaksiyonên kovar û rojnamên Kurdan him bi beşdarî bûna xwe û him jî bi mesajên xwe şevê xurt kirin.

Di şevê de bi navê Komîta Pişt-

giriya Medya Guneşî Malmîsanîj axift. Ew di axaftina xwe de bi kurtî li ser rojnamegeriya Kurdî sekîni û got ku di şertên Tirkîyê yê îro de derketina kovarek Kurdan serfiraziyek mezin e û divê piştgiriya xebatkarên kovara Medya Guneşî bê kirin.

Serokê Beşa Kurdî ya akademîya Zanistî ya Ermenîstana

Dûmahîk r. 11



Rojeva Mehê

**Defa
"Meqamê Demokrasiyê"
û Mezbahên Însanan**

Serokwezîrê Tirkîyê, Turgut Ozal, bi wesîla çûyîna xwe ya Fransa ya dawîya meha Çiriya Paşin, carek din dengê dahol(lef) û zurna xwe bilind kir, meqamêki xwedêgiravî jî meqamên demokrasiyê pêşkêşî dilanê kir. Bû hînge-dînga wî ya li ser mezinbûn û pêşveçûna Tirkîyê ya di warê aboriyê de. Tirkîye jî alî civakî, aborî û siyasî de di nav hemleyek pêşveçûnê de bû, demokrasiyê xeml û rewşa xwe bi ser çaralî Tirkîyê ve berda bû, di nav çend salan de Tirkîyê di ser qirnekî re qevaz dida ser qirnekî din.

Lêdana "Meqamê demokrasiyê" û hînge-dînga li ser qirneqevazbûna Tirkîyê, hemû jî bo wê yekê bû ku Turgut Ozal karîbe tîkîliyên aborî û siyasî yên Tirkîyê bi Fransa re xurttir bike û hukûmeta Fransa li ser wê yekê razîbibe ku Tirkîyê rojeke zûtir bibe endamê Civaka Avrûpa ya Aborî.

Turgut Ozal herçî def û gopal di dest de misewa li "Meqamê demokrasi" dide, lê leystîka ku li Tirkîyê hatiye li darxistinê ne dilana demokrasiyê ye. Li hundirê welat borazana hewara şer û êrişê perda guhan diçirine. Kedxurî û xwînmêjiya giran, êriş û terora dewletê rabûye pêdare. Buhabûn, feqîrî û belengazî û bêkarî li bayê bezê bilind dibe. Bi hezaran girtî di zindan de, di bin rewşek ne însanî de tên pelçiqandin. Rewşa neinsanî ya zindanan bûye wek mezbahên insanan. Loma jî dema Turgut Ozal li Fransa dengê "Meqamê demokrasiyê" bilind kir, jî zindananê Diyarbekir, Eskişehir, Amasya, Ceyhan, Aydın, Nazilli, Meletya, Erzincan, Adana û Stenbolê jî dengê protesto û grewa birçîbûnê ya bi hezaran girtiyên siyasî bilind bû.

Durûtî û rûreşîya rejîma faşîsta Tirkîyê eşkeretîrîn di siyaseta li ser girtiyên siyasî de xuya dibe. Ev serê salan e ku girtiyên siyasî, jî bo rakirina rewşa dijwar a zindanan serî hildidin, dikevin grewên birçîbûnê û yên mirinê, xwe didin kuştin. Her carê ku cih li hukûmeta diktatoriyê teng dibe, bi fêlbazî xwe nerm dike, biryar û beyanan derdixe ku wê edî rewşek însanî li zindanan bê lidarxistin. Lê her carê ku hînekî wext di ser re derbas dibe, rejîm carek din îşkence, lêdan û pelçiqandina ser girtiyên dijdine. Ev yek carek din girtiyên tîne bêtehemulyek wê derecê ku mecbûr bimînin serî hildin, tekevin grewa birçîbûnê.

Eşkere ye ne demokrasiyê û jîyanek însanî hatiye Tirkîyê û ne jî rejîma îro dixwaze welat ber bi demokrasiyê, azadî û rewşa însanî re bibe. Meqamê ku Turgut Ozal jî lê dide ne jî bawerîya wî ya demokrasiyê tê, dixwaze ku li derve û li hundirê welat xelk wilo jê bawer bikin. Lê ka gelo welatekî ku bi mezbahên insanan dagirtîbe, "Meqamê demokrasiyê" ya ku Ozal lêxe wê kê rake dilanê.

Uzir

Xaçepîrsa bi diyarî ku me di hejmara berê de çapkiribû, di nivîsandinê de du xeletî hene.

Rastiya wan pîrsan ev in:

Serejêr:

5- c) kevir, te'ht, zinar

17- a) Heya, şeref, a'r, namûs.

Xwendevanên me karin van her du ciyan vala jî bêlin.

Ji ber van her du xeletiyên me zemanê bersivdayînê 15 roj dirêj kir. Zemanê dawîn 15'ê Çileyê Paşin (Jenuary) e.

Prof. Dr. M. A. Hasretyan:

"Di dema glasnostê de divê kêmasî rast bibin"

Rojnama Izvestiya di 16'ê Îlonê de hevpeyvînek bi Kurdnasê Sovyetî Prof. Dr. M. A. Hasretyan re çêkir. Em Kurdiya vê hevpeyvîne pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

Pîrs: Aşîkare ku Kurd jî gelên Rojhilata Navîn gelekî herî kevintirîn e. Ev qedera wan ya dîrokî çawa bûye û rewşa wan ya îro çiyê?

Bersiv: Bi rastî di dîroka Rojhilata Nêzîk û ya Navîn de ciyekî Kurdan yê berbiçav heye. Ew tevî hemû bûyerên girîn ên vê herêmê bûne. Kurden ku kultura xwe ya orjînal jî qirnan gîhandine qirnan, alîkarî û xizmetek mezin gîhandine pêşveçûna manewî ya gelên Tirkîyê, Îranê û hin gelên welatên Ereb.

Bi tesîra Şoreşa Mezina Oktobêrê di tevgerên rizgariya millî de ku gelên Rojhilata Navîn û gelê Kurd li dijî hêzên ew xistibûn bin nîrê bindestiyê bilindbûnek mezin destpêkîriye. Di dûre jî bersebebên objektîf û subjektîf Kurd û Kurdistan di nav Tirkîyê, Îran û Iraqê de perçe bûye û bi vî hawî mesela Kurd derketiye ortê. Di roja îro de li gor zanînen p' bawerî pê tê li Rojhilata Navîn û ya Ortê 20 milyon Kurd dijîn. 10 milyonê jî ve hejmarê li Tirkîyê, 6 milyon li Îranê, 3 milyon li Iraqê û milyonek jî li Sûriyê ye. Bi hawakî şiklî Kurd wek welatîyên van dewletan bi gelên Tirk, Faris û Ereb re xwediyê mafên wekhev in. Wan, wek gelekî cihê nasnakî, hetta di nav sinorên van dewletan de rê nadin ku mafên xwe yê yekîtîya netewî û terîtoriyal pêk bînin. Li gelê Kurd hebûna xwe ya netewî, zimanê xwe, kultura xwe, urf û adetên xwe parastîye. Îro hejmarek gelek mezin welatperwerên Kurd mecbûr mane ku derkevin dervayî welat, welatên Ewropa Rojava. Vana li welatên lê bi cî bûne li merkezên ilm û kulturî yê Kurd ên cihê cihê, di organîzasyonên civakî polîtîk de cî digrin.

Dibê bête diyarkirin ku mesela Kurd li her welatekî Rojhilata Navîn xusûsiyetên li gor xwe hene. Ev, zêdetir nuansên politîka rejîman, ferqiyeta rewşa civakî-aborî ya Kurdan bi tevgerên wan ê netewî li van welatan dikare bê îzahkirin.

Pîrs: Mesela Kurd bi dirêjîya salan bêtir ku hel bibe ma. Di roja îro de xusûsiyetên merhele tîkoşîna gelê Kurd çi ne?

Bersiv: Di roja îro de mesela Kurd li welatên Rojhilata Nêzîk û Rojhilata Navîn de aktueliya xwe diparêze. Esas, ev bi pêşketa şiyarbûna millî û merhele tîkoşîna jî bona tayînkirina qedera xwe û hêzên serdest ên van welatên ku Kurdistan perçe kirine û mafê Kurdan ê meşrû jî nas nakin ve girêdayî ye.

Tevgera Kurd a netewî îro ketiye merheleke nuh. Di salên 20'an û 30'î de serhildanên Kurd jî alî nûnerên fe-

odalên Kurd axa-şex û serokên eşîretan ve di hate îdarekirin, lê îro Kurdan nisbî partiyên ciddî yên polîtîk avakirine û jî bona mafên gelên xwe yên netewî û sosyal bi cî bînin programên van yên tîkoşîne hene. Bi vî yekê re jî hindik be jî hîn di navbera partî û hêzên Kurd de dubendî hene.

Di tevgera Kurd a netewî de belavbûna fikrên sosyalîst divê bête girtin diqetê. Bi taybetî di nîveke duduyan a salên 70'î de û di nîveke destpêka salên 80'î de hedefên programên partiyên Kurd ên siyasî ku qebûl bûne îşaretî ve yekê dike.

Pîrs: Ji bona Kurdan xebatên ilmî ne bes li welatê me, her wisa li welatên din jî dibin. Di îzaha mesela Kurd de di navbera alimên Sovyetî û yên Rojava de gelo tu ferq heye?

Bersiv: Li Rojava li ser dîroka Kurdan xebatên ku meriv nikare bibîne hatine çêkirin. Di nav wan de li gel lêkolînên hêjayî diqetê, bi mustewa, ciddî û bi nîyeta rind hatine kirin. Lê di eynî wextê de yên bi nîyeta xerab çêbûne jî hene. Wisa ku, li Rojava li ser dîroka Kurdan, bi taybetî jî lêkolînên li ser gelên dema nêzîk hatine çêkirin li gel hebûna qerekerê wan ê konjonktûrel, li Rojhilata Nêzîk û Ortê armanca alîkariya xurtkirina rewşa dewletên împeryalist dajon. Di xebatên wan de, mesela Kurd di esase xwe de li gor menfeetên Rojava ya jî li gor dijayetî û ne dijayetîya menfeetên rejîmên herêmê jî bo bika-

ranîna armancek wisa lê tê hûr bûn.

Bi çend gotinan dixwazim qala xebatên hevalên xwe yên alim ku li ser mesela Kurd dixebitin bikim. Li welatê me, merkezên ilmî ku li ser dîroka gelê Kurd, edebiyata wî, ziman û problemên etnografiyê tehlîlan dikin hene. Li gelê vî divê ez diyar bikim ku em bala xwe zêde nadin mesela Kurdî. Li gor dîtina min, monografiyên populer ku jî alî girseyek fireh xwendevan ve tê xwendin û meqalên hindik in û suxrewarî ne. Problemên aktuel ên jiyana îro yên Kurden derva jî alî pressê ve pîr hindik tên ronî-kirin. Di dema me ya glasnostê de wisa difikirim ku, ev kêmasî divê û mecbûriye ku rast bibe.

Pîrs: Li gor dîtina we mesela Kurd bi qelsiyên xwe yên îro ve mirî wê çawa dikare guherandineke pêştir derbas bike?

Bersiv: Tecrubeyên borî nîşan didin ku keftûlesta û siyaseta berpirsiyarên dewletên Kurdistan par ve kirine ku ve problema tevlihev bi alîkariya tedbirên leşkerî îdara resmî û polîsî, bi riya zorê hel bikin îflas kiriyê.

Viya jî nîşan daye ku, helkirina mesela Kurdî bes dikare, li ser binhegeki demokratîk bibe. Ev wê ne tenê jî gelê Kurd re ku gelek eziyetên nedîtî kişandîye wek hemû gelên din tayînkirina qedera xwe ya netewî û mafên azadiyên sosyal û aşî û huzûrê bîne, her weha wê di Rojhilata Nêzîk û ya Navîn de jî bona rewş bigihê îstîq-rarekê wê bi hawakî girîng alîkariyê bike û wê hêzên derva yên kevneperest jî îmkânên dijîyatîyên herêmê jî bo armancên xwe bi kar bînin mah-rûm bihêle.

PPKK:

"Divê em tîkoşîna bi rêxistinî xurttir bikin"

Komîta Merkezî ya Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan (PPKK) di nav meha Çiriya Pêşin de civiya. Di civîna xwe de li ser pîrsên dinyayê, yên herêmê û yên welat, karên rêxistinî û siyasî ên ku li ber partiyê ne munaqeshe kir û biryaran girtku li ser pîrsên rojava partiyê ne, raya partiyê tesbît kir, bibelavokekê, bi kurtî jî raya giştî re îlan kir.

Belavoka PPKK li ser rewşa cihanê, pîrsên aşîtiyê, şerê Îran û Iraqê û neftê şer disekine, piştî rawestandina şer êrişên rejîma xwînmij a Iraqê li Kurdistanê rûreş dike û li ser rewşa multeciyên Kurdistanê Iraqê disekine ku li Kurdistanê Tirkîyê bi cî bûne. Lê bê dengiya welatên sosyalîst û di serî de ya Yekîtîya Sovyet li hember êrişên barbarî yên Iraqê rexne digre û dibêje ev siyaseta "li Rojhilata Navîn û li dinyayê bêtir ku zirarê bide sistema sosyalîst û tevgera komunist a navnetewî, aşîtxwazan û hêzên rizgarîxwazên netewî û hêzdayîna rewşa emperyalîzmê, kêrî tu karî nayê"

Di dawîya belavokê de jî li ser rewşa partiyê û TEVGERê radiweste û weha dibêje:

"Di civîna Komîta Merkezî ya PPKK de li ser pêşdebirina tîkoşîna rêxistinî jî hate sekinandin û bi girîngî hat gotin ku hemû endamên partiyê divê bi berpirsiyariyê zanyarî çavîyên rêxistinî geş bikin.

KM ya PPKK, destnîşana wê pêwîstiyê kir ku, TEVGER pêşdetirîn yekîtî ye ku heta nuha li Kurdistanê Tirkîyê hatiye avakirin, divê ev gav bi beşdarkirina hemû hêzên welatparêz ên ku li dervayî wê mane, bê firehkirin, gava ku hatiye avêtin bi gavên nuh bîn pêşde xistin û bangî hemû welatparêzên Kurdistanê Tirkîyê dike ku piştî bidin ve yekîtîyê".

**Adresa : Armanc
P. Box: 6004
172 06 Sundbyberg / Sweden**

**Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC
Telefax: ATTN ARMANC 46-8-208006**

**Ansvarigutgivare:
Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9, ISSN: 0348 7385**

Ji Rapora Amnesty ya 1988'an

Kurd ji bo tevgerên xwe yên politîk û kulturî tîn mahkûmkirin

Rapora Amnesty International (Organîzasiyona Efûyê a Navnetewî) ya 1988'an hat weşandin. Em ji vê raporê beşê Tirkîyê û Iraqê bi kurtî didin.

Li Tirkîyê bi hezaran kes ji ber bîr û baweriyên xwe yên siyasî hatin girtin. Îşkence bi hawekî firehî û bi sistematîk dom dike. Par bi îşkencê 17 kes hatin kuştin. Mahkemên leşkerî û sivil dîsa 28 cezayê îdamê dan. Heta dawîya 1987'an li parlamentoyê 159 îdam benda li testîqê bû. Li gor beyana Komela Mafê Mirovî li Tirkîyê 18.000 kesên siyasî di hefsana dane.

Rapor; li ser doza DÎSK'ê û dewa Komela Aştiyê disekine û qala mahkemên TKP, TÎP û TSÎP'ê dike. Rapor cih dide vegera Sekreterê TÎP'ê Nihat Sargin û Sekreterê Giştî yê TKP Haydar Kutlu ku nuha ew di hefsana Enqerê de ne.

Li gor rapora Amnesty; di navbera salên 1984-1987'an de li bajarên Diyarbekrê, Sêrtê, Rihayê, Wanê û Hakkariyê 9512 kes hatine girtin û dawa 2811 kesên di mahkemên leşkerî de hatiye dîtin. Li gora raporê piraniyên kesên

Kurd ji ber ku zordarî(şiddet) bi kar anîne ew tîn mahkemekirin. Lê dîsa li gora raporê ji bo tevgerên xwe yên politîk û kulturî jî kes hene ku tîn mahkeme kirin. Rapor, di nava van kesan de Berpirsiyarê Weşanxana Komalê Recep Maraşî û serokê kevn ê Belediya Diyarbekrê Mehdî Zana nîşan dide. Û di raporê de tê gotin ku, Mahkema Emnî ya Dewletê ya Stenbolê 4 sal û 2 meh ceza daye Mustafa Evlek û Elî Dogan ji ber ku van kesan bi zanetî muzîka Kurdî guhdar kirine.

Di beşê Iraqê de jî rapor li ser girtin, lêdan û îdamên rejîma Iraqê disekine û dibêje: Bi hezaran kesên siyasî di sala 1987'an de bê sebeb hatin girtin. Bi sedan kes bê mahkeme hatin daliqandin. Di navbera dalqandinan de zarok, dê û bavên ku zaroyê wan siyasî bûne jî hene.

Rapor wiha dom dike; bi hezaran kesên ku di girtîgehan de ne endamên Dawa El Partî, Partiya Komunîst a Iraqê, Partiya Demokrat a Kurdistan, Yekîtiya Nişîmanî Kurdistan, Partiya Sosyalîst a Kurdistan a Iraqê û Partiya

Demokratî Gelê Kurdistan in.

Li gora rapora Amnesty di meha Çiriya Paşin û Çiliya Pêşin de 360 kes hatinê îdamkirin. 116'ê vana Kurdên siyasî yên mintîqa Suleymaniyê, Hewlerê, Kerkukê, Dihokê û Zaxoyê bûn. Di nava van kesên îdamkirî de kesên di navbera 14 û 17 salî de 17 jî hebûn.

Di 11'ê Çiriya Paşin de di navbera 100-150 Kurd û di 14 û 18'ê Çiriya Paşin de jî li herêma Erbilê 32 Kurd dîsa bê mahkeme hatin îdam kirin. Di dawîya Çiriya Paşin de 150 girtiyên di hefsana Ebû Xerîb de bi gulebaran hatin kuştin.

Amnesty di rapora xwe de cî dide Kurdên ku bi jehrê hatine kuştin jî. Di wî warî de jî rapor wiha dibêje: 40 Kurd ji alî rejîmê bi jehra mişkan hatin jehrîkirin. Li herêma Suleymaniyê li bajarê Marfa yê di 24'ê Çiriya Paşin de 10 Kurd hatin jehrîkirin. Ji vana 3 kes di cî de mir in, 3 kes jî rakin nexweşxanê.

Amnesty li dij wan kirinan pîrri caran bala rejîma Tirkîyê û Iraqê kişandiyê.

Ji bo bîranîna Kurdnasekê



Margareta Berge Ekblad

Dosta milletê Kurd û karmenda pirsên malbat û penaberên Kurdan, xanîma delal Margareta Berge Ekblad di 27'ê Çiriya Pêşin(October) de ji ber nexweşiyek bêçare ji jiyane xatir xwest.

Di sal 1979'an de Margareta'yê hin nû xwendegêha bilind xilas kiribû. Ji wê dipirsin: "Tu dixwazî wek pedegoga malbatên Kurdan kar bikî?" Ev bê dudilî dibêje: "belê ez dixwazim wî karî bikim".

Margareta'yê ev karê han ji bo xizmeta malbat û gencên Kurdan ji dîlsoziya xwe hilbijart. Wê nêzî 8 salan bi dilxwazî û bi bawerî ji bo Kurdan kar kir. Bi meylîdariyek mirovîzî û bi hemû hêz û vîyana xwe, ew bû hogira Kurdên li bajarê Uppsala'yê.

Margareta li hember neheqî û kêmasiyên di ciwatê de bi xurtî derdiket. Wê, her tim cihê xwe li ba mirovên neçar û belengaz digirt. Û ji bo ronîkirin û çareserîkirina pîrsgirêkan bi hemû zanistîya xwe rê nişanî heval û hogirên xwe dida.

Margareta'yê ji karê xwe gelekî hez dikir. Her çiqas wê nexweşîya kambax ew diêşand jî, lê wê dîsan jî di her fîretê de bi dilxweşî karê xwe dikir. Çi mixabin ku wê wê spasî jiyana xwe kir û xatir ji wê cihanê xwest..

Bi vî xebera reş hemû malbat û penaberên Kurd xemgîn bûn û şîna wê kirin. Di 11'ê Çiriya Paşin rojeke payzê bû, li erdê belekiyên berfê, li ezmanan mijekî sivik hebû. Em jî di şîna xanîma delal de bûn. Ref bi ref jin, mîr û pîrên Kurdan heval û hogirên Margareta'yê dihatin xatir ji wê dixwastin. Li ber derê dêrê, di çavên wan de histêrîna cemidî, di destên wan de gul gelekî kes li hev civîbûn.

Eyam ne ewqas sar bû, lê jî xemgînî û jî dîlşkestiyê laş û bedenên me dilerizîn. Heval û hogirên Margareta'yê bi kincên

reşgîrêdayî dihatin ber dêrê. Li ber dêrê wan bi çend peyvên sersaxî li malbata Margareta'yê dikirin.

Li mîmbera dêrê tabûta xanîma delal bi gul û kulîlkên sor, zer û gewherî hatibû xemilandin. Te digot mîna bûkekê nû zewicî bi rengên sor, zer û kesk xelî li wê kiribûn Ji hawirdorê tabûtê heta ber dergehê dêrê jî kulîlk û tacêgulan gulistanek hatibû çekirin.

Li ser textebendên dêrê, mirovên ji her nijadê û ji her olê(dînî) bédeng û stûxwar rûniştibûn. Wek keşeyê dêrê jî di axaftina xwe de got: Iro nas û hevalên Margareta'yê ji her nijad û olê di şîna wê de rûniştin e. Keşe dîsan bi dengêkî dilşewat bangî mirovîzî û wekhevîya di navber nijad û olan de kir. Wî behsa welatê me Kurdistanê, heval û hogirên Margareta'yê ên Kurd kir û xêrhatin da me.

Dengê flûta hevalê Margareta'yê dil û cigerên me dîperitand. Margareta'ya ji muzîkê gelek hez dikir, sedayekî wê yê gelekî xweş hebû. Wê çend stranên Kurdî jî dizanibû.

Piştî axaftina keşe, tabûta Margareta'yê ji mîmbera dêrê hildan û li ereba cenaze kirin. Em li dû ereba cenazê ketin rêzê û me berê xwe da goristanê. Di rê de bi dengê gelek nîzm iske-iska girîyên jinên Kurdan dihat guhê me. Ger rê bidana wan, wan ê mîna li welêt bi dengêkî bilind bigirîyana û staranên şîna jî bo wê xanîma delal bigotana. Lê wan dizanibû ku di toreya Swêdiyan de girî tune ye...Ew di dilên xwe de digrin.

Li goristanê, li hawirdora gorra Margareta'yê ji mirovan qor bi qor çend xekek hatibûn çekirin. Ew stû xwar bûn, di ber xweda bi dizî digriyan. Histêrînan bi ser gulên di destê wan de mîna peşken barana payzê dihatin xwar. West hatibû, divê me xatir ji wê xanîma delal bixwesta. Di destên me de gulên sor, em rêz bi rêz hatin ber gorê. Bi çend peyvên paşin ên ji nav dilên me dihatin, tev gulên xwe me avêtin hundir gorê û me xatir ji wê xwest...Me li wargaha wê ya dawiyê ew bi tenê hişt û em çûn.

Spas Margareta! Ji bo mirovîzî û mirovatiya te.

Şoreş Zîrek

Konferansa Ciwanan

Di 19 û 20'ê Çiriya Paşin de Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê li se rewşa ciwanên Kurd ên li Swêd dijîn konferansê amade kir. Di konferansê de bîyî temaşevanan, nûnerên komelên endamên Federasyonê û berpirsiyarên Federasyonê beşdar bûn.

Serokê Federasyonê Keya İzol, li ser navê Yekîtiya Ciwanên Kurd li Swêd ku seksiyonek federasyonê ye xortek, sekreterê TOB-DER'ê yê kevn û redaktorê kovara Berhem Mustafa Duzgun û Umer Şêxmûs wek axaftvan beşdarî civînê bûn.

Mustafa Duzgun bi giranî li ser rewşa ciwanên Kurdistanê Tirkîyê sekinî û bi teferuat qala jiyana û problemên ciwanên gundî, karker û xwendevan kir. Wî bi kurtî ji destpêka sed sala 20'an heta nuha rewşa siyasî ya xortan di tevgera netewî de anî ziman. Umer Şêxmûs jî li ser jiyana û problemên ciwanên Kurd li Kurdistanê Iraqê, Îranê û Suriyê sekinî. Dûvre jî problemên ciwanên Kurd li derveyî welat anî ziman. Beşdarên civînê li ser mijarê munaqesên heja kirin.

Bîyî Kurda, mîvanên Swêdî jî di konferansê de axiftin. Nûnerên li ser navê Daira Biyaniya, Wezaretê Kar û Şewirdariya Dewletê ya Karû-barê Ciwanan axaftin.

Konferansa Jinan

Di roja 12'ê meha Çiriya Paşin de Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê di derheqê pirs û problemên jinên Kurd li Swêd konferansê amade kir.

Di konferansê de berpirsiyarên Federasyonê, Komela Demokratîk a Jinên Kurdistanê û hin nûnerên jin ên li ser navê civata Kurd ku li derveyî Stockholm dijîn, beşdar bûn. Li ser rewşa jinan û ji bo helkirina problem û pirsên wan axaftin û pêşniyar hatin kirin.

Ji derveyî Kurda çend jinên Swêdî ku li ser pirsê xwedîgotin bûn jî axiftin. Nemaze axaftina Nely Yden ku li ser navê Daira Biyaniyan hatibû gelek balkêş bû.

Di navbera konferansê de xwarinên Kurdî pêşkêşî kesên ku beşdarî konferansê û wek temaşevan hatibûn, kirin. Cilên Kurdî, neqîş û hin tiştên ku jinên Kurd bi destên xwe çekiribûn hatin pêşkêşkirin. Di dawîya konferansê de dengbêja Kurd Gulistan bi çend sitranên xweş konserek piçûk da.

Konferansa Y. Kuçuk

Di 20'ê meha Çiriya Paşin de nivîskar û alimê Tirk Yalçın Kuçuk konferansê da. Di konferansê da li dor 200 kesên guhdar beşdarbûn.

Mijara Konferansê "Di Salên 1998'yan de Tirkîyê" bû. Civîn ji konferansê zêdetir wek civîneke sohbetê bû. Ew li ser tarîx, îdeolojî, çand, siyasat û h.w.d., sekinî, lê çî feyde wî wek pirtûkên xwe bîyî ku mesela bi hev girêde, bi awayek belawela axift.

Piştî axaftina Y. Kuçuk, hunermenda naskirî Bilgesû Erenûs bi çend sitranan konserek piçûk da. Ji van sitranan yek li ser Helepçê bû. Piştî konserê, Y. Kuçuk bersîva pirsên guhdaran da. Di konferansê da tiştê balkêş ew bû ku piraniya guhdaran Kurd û pirsên hatin pirsîn ji sedî 90 li ser pîrsa Kurd û Kurdistanê bû.

Semînera Prof.Şakirê Xudo

Di roja 13'ê meha Çiriya Paşin de li Stockholmê Serokê Beşê Kurdnasiyê li Enstîtuya Rोजहितnasiyê ya Akademiya Zanistî li Ermenîstanê Profesor Şakirê Xudo semînerê li ser "Xebata Kurdnasiyê li Sovyetê" da. Semîner li Stockholmê jî aliyê Federasyona Komelên Kurdistan li Swêd û Akademiya Kurdî ve hat amadekirin.

Prof. Şakirê Xudo bi dîr û dirêjayî li ser lêkolîn û xebatên Kurdnasiyê li Sovyetê agahdarî da. Di wî warî da li ser xebatên tarîx, ziman, folklor, edebiyat û hwd. sekinî û ji wan xebatan hin nimûne da. Piştî semînerê jê hin pirs hatin pirsîrin û wî jî bersîva wan da. Di semînerê de ji 200 kesî zêdetir guhdarvan beşdar bûn.

Têkoşîna gelê Kurd bi alîkariya kesî nehatiye meydanê

Piştî êrişî dîktatoriya Seddamê destbixwîn a ser hêzên Kurdîstana Iraqê, li hundur û li derî welat ji nav Kurdên Kurdîstana Tirkîyê hin dengên rexnegîr bilind bûn. Xwediyên van rexnan ji peydabûna rewşa dawî bi pirranî hêzên Kurd û siyaseta wan a "çewt" berpirsiyar dîtin. Lê dibê em eşkere bibêjin ku di nav van rexnan de hinekên wan hebûn ku ji nêrînek objektîfî û tehlîkirina rewşa konkret bê-tir, aqildayîn û şîretên vala bûn. Em dizanin ku di demên wisa de kesên aqilmend û şîretkir pirr dibin; esas ev yek zêde ne xerîb e. Ev li alîkî, li aliyê din di nav toz û dûmana şer de hin tiştên wisa hatin gotin ku ji sînorên şîretan jî derbas kirin; di warê îdeolojîk de dîtinên çewt bûn û di warê rastiya rewşa îro de jî rexnen ne di cî de, ne rast bûn. Heta ji van kesên rexnegîr hinekên wan şerê gelê Kurd yê li dijî dewletên kolonyalîst û rejîmên kevneperest ji bo mafên xwe yê netewî û mirovî, wek şerê ku li dijî gelên van dewletan be şirove kirin.

Têkoşîna gelê Kurd bi alîkariya "hêzeke derva" nehatiye meydanê

Mesela; M. Alî Aslan di vî warî de wisa got: "Divê Kurd bi alîkariya hêzên derva li dijî gelên ku bi wan re di nav yek sînorî de dijîn şer nekin. Divê ew fersendê nedin, ku di navbera gelên bi wan re di nav sînorekî de dijîn dujminatî çê bibe, hisên kîn û întiqamê hişin bibin û pêş de herin." (Kovara 2000'e dogru-18 Eylul 1988)

Bi qasî ku xuya ye M. Alî Aslan şerê gelê Kurd li dijî dewletên kolonyalîst ji bo serxwebûn û azadiya xwe wek şerê ku li dijî gelên wan welatan dibîne. Komantarek din ne mumkûn e. Ji ber ku îro li Kurdîstana Iraqê rewşek berbiçav heye û ew jî li ser vî gelşî berbiçav û konkret dîtinên xwe wisa tîne zimên. Yanî tiştê li ser tî axaftin ne pîrensîbekî gelemperî û muceret(abstrak) e. Bi qasî ku em dizanin M. Alî Aslan ne merivekî nezan e, xwe sosyalîst dihesibîne û di nivîsa xwe de jî hîn lîteratûra sosyalîzmê bi kar tîne. Lema jî dibê wî bizanîbiya ku şerê gelê Kurd ne li dijî gelên Erebb, Faris û Tirk e. Bileks serxwebûna gelê Kurd ji bona gelên Erebb, Faris û Tirk jî piştigiriyek girîng û karê mezî e. Bira ev jî li alî-kî bimîne, her kes dizane ku li Iraqê cepheyek heye, di vî cephe de gelên Kurd û Erebb mil bi mil li dijî rejîma Seddam şer dikin. Piştî ku rastî ev e, meriv tê nagihîje ji bo çî M. Alî Aslan şîretan dike, dibêje bira "Kurd li dijî gelên bi wan re di nav yek sînorî de dijîn şer nekin". Bûyereka weha tune ye ku M. Alî Aslan vî "şîretê" dike. Rexne li tiştê tune nayê girtin.

Gelê Kurd sînorên îro mûqeddes nabîne, ji bona rakirina wan şer dike

Wer xuya ye ku M. Alî Aslan sînorên ku îro gelê me bi darê zorê ji

hev perçe kiriye ji xwe re hinekî mûqed-des dibîne, bi kêmasî daxwazek wî, ya guherandina van sînoran tune ye. Ya wî tune ye, lê bi zîmanekî şîretkar dixwaze ku gelê Kurd jî daxwazek wisa neke. M. Alî Aslan tiştê ku jî bir dike, ew jî, sînorên ku îro welatê me perçe kirine ne bi destê gelê Kurd, li derî îrada wî jî alî hêzên împeryalîst û dewletên kolonyalîst ve hatine danîn. Lema jî têkoşîna gelê Kurd ji bona guherandina van sînorana ye; ne ku nola sînorên mûqeddes wan qebûl bike. M. Alî Aslan viya dixwaze.

Gelê Kurd ji paş de li tu kesî nexistiye

M. Alî Aslan di derek din a nivîsa xwe de dibêje: "Hedîsa Iraqê jî nîşan da ku heger hûn, gelê ku bi we re dijî bi pelçiqînî, mafên wan ji wan bistînin, wenda bikin, ya jî ji bo ku wan ji ortê rakin bixebitin, di wextek we ya zêf de ewê jî ji vî fîrsendê feydeyê bibîne û li we xe."

Carê berî her tiştî ev gotinên M. Alî Aslan ji mefhumên çîmî û sosyalîzmê gelekî dûr in, ev yek. Ya du-duyan di esasê xwe de M. Alî Aslan şîretan li burjuwaziyê Tirk dike, dibêje: "Mêzekin, tiştê hat serê Iraqê dikare sibe were serê we jî. Ji ber vî yekê jî divê hûn siyasetek wisa bimeşînin ku rojekê Kurd ji paş de li we jî nexin. Wisa xuya ye ku M. Alî Aslan jî di bin tesîra demagojî û propoganda ku Kurdan "ji paş de li Iraqê xist" de maye. Wek tê zanîn ev, demagojiya Seddamê mucrim bi xwe ye. Ew jî dibêje, "ji ber ku Kurdan di roja me ya zêf de ji paş de li me xist, lema em jî îro wan ceza dikin". Ev propagandeyek vala û derew e. Çîma?

Cîhan hemû dizane ku şerê gelê Kurd li dijî dîktatoriya Seddam bi herba Îran û Iraqê re destpêkiriye, berî vî herbê bi pênc salan gelê Kurd li serê çiyayên Kurdîstanê şerê çekdarî dida. Ya din, hêzên Kurd her tim xwestine ku vî gelşî bi rîyeke aşîti, bê şer û kuştin hel bikin. Lê rejîma Seddam tu carî ev daxwaza hêzên Kurd qebûl nekiriye, her car bi kuştin û qetlîamên girseyî bersiv daye gelê Kurd. Yekî ku hema hinekî haya wî ji cîhanê hebe divê vî rastiye bizanibe. Qet ne veşartîye, her kes dizane ku rejîma Seddam ji hêzên Kurd dixwest ku bê qeyd û şert ew çekên destên xwe deynin, teslîm bibin û herin li dijî Îranê şer bikin. Hêzên Kurd jî ev daxwaza dîktatoriya Seddam qebûl nekirin, teslîm nebûn û neçûn li dijî Îranê şer nekirin. Bê guman ev biryar rast bû, ne ku wek tê gotin, "di roja zêf de ji paş de li Iraqê xistin" bû.

M. Alî Aslan dema bi vî îddîa jorîn hêzên Kurd gunehkar dike, ne wek sosyalîstekî, wek berpirsiyarê dewletê li meselê dinêre. Ji ber ku li gora îdeolojî û siyaseta çîna karkir ne rast bû ku hêzên Kurd li gel ordiya Seddam li dijî Îranê tîketana şer. Çimkî şer, şerê neheq bû, lema jî şoreşger û pêşveruyên her du welatan jî li dijî şer derketin. Li gor qewet û îmkanên

xwe di vî warî de têkoşîn dan. M. Alî Aslan li ser navê sosyalîzmê aqil dide millet, lê ji bir dike ku di şerê ku wisa neheq de wezîfa hêzên şoreşger ew e ku lûlên tivingên xwe tîxin sînga burjuwaziyê xwe, yanî ji "her alî de" lîxin, ne ku bi burjuwaziyê xwe re êrişî welatekî din bikin. Bi burjuwaziyê xwe re meşandina siyasetek wisa jî ya Kautskî ye, ne ya şoreşgeran e.

M. Alî Aslan bi dîtinên salên 50'î û 60'î li mesela Kurdî dinêre. Bê şik ev dîtin ji binde çewt e. Ji ber ku tevgera Kurd ji zûda ye ku ev qonax derbas kiriye. Çi mixabin ku M. Alî Aslan jî pirr li dû maye.

Rizgarbûna gelê Kurd ne li ser "îmhabûna gelên bira" ye

Îbrahîm Guçlu jî wek M. Alî Aslan rexne li siyaseta stratejiya hêzên Kurd digre, dibêje:

"Vî şerî jî carek din nîşan da ku li ser îmhabûna gelên bira rizgarbûna gelekî din ne mumkûn e" (2000 Bîne Dogru 18 İlon 1988)

Li gor van gotinên Î. Guçlu meriv dibê qey şerê Îran û Iraqê bi biryara Mesût Barzanî û Celal Talabanî destpêkiriye, yan jî hêzên Kurd ji bona firotana çekên xwe her du dewlet berra hev dane û stratejiya xwe jî li ser îmhabûna gelên van welatan ava kirine. Bê şik ev dîtin ne ciddî ye, îddîayek ne rast e. Û jî wî jî girîngtir, îthamkirina hêzên Kurd bi siyasetek wisa, ji bona Î. Guçlu bê talîhiyek mezî e. Ji ber ku Î. Guçlu jî dizane ku hêzên Kurd tu "gelên bira" berra hev nedane û rizgarbûna gelê Kurd jî li ser îmhabûna gelên Erebb û Faris ava nekiriye. Em dizanin ê şer dirxistiye Seddamê destbixwîn e, yê şer pîj kirine û jî vî siyaseta bi milyon dolar qezenc kirine hêzên împeryalîst in, ne hêzên Kurd in. Li gel vî rastiya berbiçav, yekî wek Î. Guçlu, serekê grûbek Kurd, ku bi kêmasî ev 20 sal e di nav politikayê de ye, gelo çawa dibe ku dikare bibêje, "Li ser îmhabûna gelên bira rizgarbûna gelekî din (qesd gelê Kurd e) ne mumkûn e?" Î. Guçlu li vî tiştê tune hêzên Kurd îtham dike. Lema jî rexna Î. Guçlu ne bes ne di cî de ye, her wisa ne ciddî ye jî. Care ez tê negihîjim, gelo ji bo çî rizgarbûna gelê Kurd wê "gelên bira" îmha bike û çawa? Û ev stratejiyek çawa ye ku dikare "gelên bira" îmha bike? Bi qasî ku em dizanin heta îro stratejiyên hêzên Kurd tu "gelên bira" îmha ne kirine, ya jî li ser îmhabûna wan ne hatine danîn. Û jî xwe ne mumkûn e jî tiştê ku wisa bibe. Ji bona dîtina vî rastiye zanebûnek pirr mezî jî ne lazîm e.

Heger em hewqasî zane ne, çîma ariyakê li serê xwe nakin?

Di kovara Berbangê de bi îmza Selîm Keya nivîsek hat weşandin, wî jî rexne li hêzên Kurd girt, di gelek warî de "riya rast" raberî wan kir. Me-

Stîriyên me

Lawikê Berrivanî

Masî û Kurd

Sala 1975'an piştî êrişî Iraqê ya ser hêzên Kurd û tîkçûna şoreşê bû... Di nav gel de dihat gotin ku Ewropî ne bi kuştina Kurdan lê bi mirina teyr û heywanên Kurdîstanê gelek aciz bûne û ev hovîtiya Seddam li hember heywanên kerr û lal bi xurtî protesto kirine û hwd. Li gor zanebûn û aqilê xwe yê wê çaxê, min ji van gotinên jorîn pirr bawer nedikir. Min ji xwe re digot, "Muheqeq rastî ne wisa ye, heger bûyereka wa bibe jî bê şik wê him li dijî qetilkirina Kurdan derketibin û him jî ya teyr û tuyên wan. Lê heta gihîştîye ba me, protestokirina kuştina Kurdan jê derketiye maye ya teyran". Û ji bona xeberek ji Ewropayê heta bigihîje Kurdîstanê, ev jî kêmasiyek ne pirr mezî bû...

Lê yekcarîna jiyana gelek rastiye ku meriv zû bi zû jî bawer nake wek topek berra nexşandî ya Qerejdaxê radixe ber çavên meriv. Jiyane du bûyare wisa raxist ber çavê min jî...

Min bira mirina xwe dibir lê qet bira wê yekê nedibir ku ezê bi xwe rojekê bi çavên serê xwe bibînim ku bi rastî Kurd bi qasî "mozên hingiv", ya jî xelaskirina 2 balînan (masiyê mezî, val) ne bi qîmet in. Ji ber ku hesasiyeta li hember qetlîama mozên hingiv û 2 masiyan hat nîşandan li hember qirkirina Kurdan li Kurdîstana Iraqê nehat nîşan dan.

Di dema êrişî Iraqê ser gelê Kurd û pêşmergên PDK-I li mintîqa Behdînan, mozên hingiv ên herêma Şemzînan jî ji çekên kîmyayî nasîbên xwe girtin. Ev qetlîama mozên hingiv ji alî pressa Tirk ve bû sebebê protestoyên mezî. Her çî hikmet bû çekên kîmyayî ne li hember gelê Kurd(!) lê li hember mozên reben hatibû bi karanîn. Min ev siyaseta rojnâmên Tirkan fahm dikir, ji ber ku mozan hingiv dida wan... Lê Kurdan wê çî bida wan?

Bûyereka din.. Di 7ê Çiriya Pêşîn de li bakurê Alasqayê çend kesên Eskîmo 2 balîna(hûtên behrê, val, masiyên mezî) ên di nav bûzê de asêbûyî dîtin. Balînan rîya xwe şaş kiribûn, ketibûn nav bahra bûzê.

Xebata rizgarkirina herdu balînan ji bo hemû Amerîka bû bûyereka gelek mezî. Tavilê pere hat komkirin di mekteban de bû mijara dersên zarokan.

Meraqa di derheqê jiyana herdu balînan de sînorên Amerîka jî derbas kir, li Moskovayê jî bû mewzûyek mezî. Li gor rojnaman nivîsandin bi hezaran xwendevan telefonî rojnama Pravdayê kirin û aqîbeta herdu masiyan pirsîn.

Hesasiyeta ji bona jiyana herdu masiyan bi vî jî nîema, Amerîka û Sovyetê bi lez destên xwe dan hev, qeweta xwe kirin yek û çûn gazî û hewara masiyan! Ku ez ne şaş bim, ji Şerê Cîhanê yê Duyem û virde ev cara pêşîn bû ku destûra gemiyek (keştiyek) Sovyetê dihat dayin ku derbasî wan sînoran bibe.

Piştî rizgarkirina herdu masiyan kaptanê Sovyetî got: "Mesele tenê ne rizgarkirina du masiyan e, ev jî babetekî nîşandana ku du gel dikarin çawa bi hev re bixebitin"

-Alên(beyreq) Sovyet û Emerîka li ser gemiya bûz-birrinê li kêlek hev li ba dibûn. Rizgarkirina du masiyan bûbû sebebê hevkarîya din dewletên super...

Du masî dibe sebebê hevkarîya Sovyet û Amerîka, lê belê jenosîda li Helepçe, kuştina bi hezaran jin û zarokên Kurd û wêrankirina hemû gundên Kurdîstanê nabe sebebê hevkarîya du dewletan!

Nexwe rast e, ji bo dewletên cîhanê jiyana bi hezaran şehîdên Kurd bi qasî du masiyan jî ne muhîm e...

sela, got ku, "wek pêwîst, pût bi piştigirî û hevkarîya hêzên şoreşger û demokrat nehat dan" (Berbang, hej. 52, İlon 1988). Ez nizanim S. Keya qala kîjan hêzên şoreşger û demokrat dike, ku hêzên Kurd ehemîyet nedaye piştigirî û hevkarîya wan? Wek ku em giş diza-

nin îro li Iraqê û li Kurdîstanê sê cephe hene; yek Cephaya Kurdîstanê ye, yek CÛD e, yek jî CEWQET' e. Hêzên şoreşger û demokrat ên li dijî dîktatoriya Seddam, çî Erebb û çî Kurd hemû di van cephan de cî digrin. Bêyî hêzên di nav

Dûmahîk r.11

Lêkolîn

Jîn (Rojname) İstanbul

Kovara Jîn di 1918-1919'an de li Îstenbolê derketibû. M. Emîn Bozarslan 25 hejmarên ve kovarê li gel wergera wan a bi tîpên (herfên) Latîni, ji nû ve da çapkirin. Li gor ku M. Emîn Bozarslan di-nivîse "jimareya wê ya paşîn, yanî ya 25'an di tarîxa 2.10. 1919'an de derketiye. Kovar piştê wê tarîxê hatiye girtin û bi wî awayî di dîroka gelê Kurd da veşîriyê."

Me'lumatên ku derheqê kovara Jînê de di gelek çavkaniyan de hatine dayîn, li hev nakin. Ev çavkanî carna behsa rojnama Jînê jî dikin û pîrî caran rojnama Jîn û kovara Jînê tevlîhev dikin. Ji wan me'lumatên baş nayê fêmkirin ku kîjan li ser kovara Jînê, kîjan li ser rojnama Jînê ne². Yek ji sedemên tevlîheviyê ev e ku di çar hejmarên pêşîn ên kovara Jînê de, li ser bergê wê bi Tirkî weha hatiye nivîsîn: "Haftalık gazete" (rojname hefteyî), "Din, edebiyat, ictimaiyat ve iktisadiyattan bahseder Türkçe-Kürdçe mecmuadır" (Kovara Tirkî-Kurdî ye, behsa tiştên dînî, edebî, civakî û aborî dîke).

Bi qasî ku tê fêmkirin piraniya nivîskarên ku behsa rojnama û kovara Jînê dikin, ev rojnama û kovar bi xwe yan jî ji wan yek ne di-tine.

Em li vê derê li ser hejmar 36.a rojnama Jînê ku me bi xwe dîtiye, hin me'lumat didin û hêvî dikin ku ev me'lumat ji bo nasandina rojnama Jînê alîkar bin.

Hejmar 36.a rojnama Jînê, berî her tiştî bi şiklê xwe ji kovara Jînê (ya ku M. Emîn Bozarslan ji nû ve daye çapkirin) cihê ye: Li aliyê çepê navê rojnama Jînê, no (hejmar), tarîxa derketina wê, navê wê û adresa wê bi Frensizî hatine nivîsîn. Dîsa bi Frensizî hatiye nivîsîn ku "rojname hefteyî ya Kurdî" ye. Ev nivîsên Frensizî, di kovara Jînê de tunene. Li ser rojnama Jînê û kovara Jînê buhayê abonetiya wan hatiye nivîsîn ku ew jî ji hev cihê ne (abonetiya salane ya kovara Jînê: 200 quruş, ya rojnama Jînê: 130 quruş e).

Hejmar 36 a rojnama Jînê, tenê du rûpel e lê kovara Jîn carna 16, carna 22 rûpel e. Ji xwe mezinahiya rojnama û kovara Jînê jî ne bi qasî hev e. Rûpeleke rojnama Jînê ji çar rûpelên kovara Jînê (ya ku M. Emîn Bozarslan daye çapkirin) mezintir e.

Meriv dikare bibêje ku li gel van cihêtiyên şiklî, ji alî navero-kê ve jî rojnama Jîn û kovara Jîn ji hev cihê ne. Tevî ku li ser kovarê îbareya "Din, edebiyat, ictimaiyat ve iktisadiyattan bahseder Türkçe-Kürdçe mecmuadır" (Kovara Tirkî-Kurdî ye, behsa tiştên dînî, edebî, civakî û aborî dîke) heye, li ser rojnama ev îbare heye: "Kürd vahdet ve kukuk-u milliyesinin müdafii siyasi, ilmi haftalık gazete" (Rojname hefteyî ya siyasî û ilmî ye, yekîti û heqên neteweyî yên Kurdan diparêze).

Mahmûd Lewendî ★ Malmîsanîj



Lê divê em vê yekê jî bibêjin ku hem berpîrsiyarê (mudir-i mes'ul) hejmarên dawîn (no: 20-25) ên kovarê hem jî berpîrsiyarê hejmar 36.a rojnama Memduh [Selîm] e.

Gelo Rojnama Jîn dewama kovara Jînê ye?

Hejmar 25.a kovara Jînê di 7 Teşrîn-î ewwel 1335/1919'an de, hejmar 36.a rojnama Jînê di 21 Hezîran 1336/4 Şewwal 1338/21 Hezîran 1920'î de derketiye. Di nava tarîxa derketina van herdu hejmaran de heşt meh û nîv ferq heye.

Gelo rojnama Jînê ya ku me li jor behsa hejmar 36. kir,

yodîk a Çapemeniya Tirkî), rojnama Jîn hem di 25.3. 1920'an de hem jî di 26.3.1920'î de yanî wek rojnameyê rojane derketiye⁴. Li gor Zinnar Silopî jî ev rojnama wek rojnameyê rojane hatiye derxistin⁵. Lê li ser hejmar 36.a vê rojnama, bi Tirkî û Frensizî îbareya "rojname hefteyî" heye.

Ger di me'lumatên Bulletin periodique de la presse Turque û yên Zinnar Silopî de şaşî tunebin, rojnama Jîn di destpêkê de rojnameyê rojane bûye lê pişt re bûye rojnameyê hefteyî.

Tê zanîn ku kovara Jîn ji alî Kürdistan Te-ali Cemiyeti û Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti (Komela Kurdî ji bo Zanî-



Memduh Selim (Fotograf ji kek Cemşid Heyderî hatiye girtin)

wek dewama kovara Jînê derketiye yan jî hejmar 36.a wê ya pêşîn û vir de wek rojnama cihê derketiye? Ji ber ku di destê me de zêde belge tunene em nikarin di vî warî de tiştê qet'î bibêjin³. Derheqê rojnama Jînê de îddîayek din jî ev e ke ew rojnameyê rojane bûye. Mesela li gor Bulletin periodique de la presse Turque (Bultena Perî-

nê û Weşanan) dihat derxistin. Piştî demê di nav berpîrsiyarên Kürdistan Teali Cemiyeti de li ser pîrsa serxwebûna Kürdistanê du dîtinên cihê peyda bûn û ji ber vê yekê çend rêxistinên Kurdîyên nû ava bûn. Li gor ku rojnameyên Tirkî di 19'yê Tirmeha 1919'an de di-nivîsin⁶ bi navê Kürt Millet Fırkası partiyek tê avakirin û program û destûr (tuzuk) a wê ji meqamên resmîyên dewleta Osmanî re têt şandin⁷. Lê welê tê fêmkirin ku program û destûra vê partiyê ji alî hukumetê nehatine qebûl kirin⁸. Li gor ku rojnameyên Tirkî di

11'yê Hezîrana 1920'an de nivîsîne, hukumetê qerara girtina Kürdistan Teali Cemiyeti daye⁹.

Serokê Kürdistan Teali Cemiyeti Seyîd 'Evdilqadir, di bihara 1920'an de dide diyarkirin ku daxwaza wî ne serxwebûna Kürdistanê ye lê otonomiya wê ye. Ev beyana Seyîd 'Evdilqadir di rojnama lkdamê de jî derdikeve. Piştî vê

yekê grûbek ji roşenbîrên Kurdan ku daxwaza Kurdistaneke serbixwe dikirin, ji Kürdistan Teali Cemiyeti vediqetin¹⁰ û bi navê Kürd Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti rêxistinekê ava dikin. Berpîrsiyarê rojnama Jînê Memduh Selimê Wanî û jî nivîskarên wê Kemal Fewziyê Hizañzade ji muessisen Kürd Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti ne¹¹. Li gor hin çavkaniyan Memduh Selim sekreterê Kürd Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti bû¹².

Li gor Zinnar Silopî, rojnama Jîn ji alî grûba ku Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti avakiriye, hatiye derxistin¹³. Di hejmar 36.a rojnama Jînê de jî derheqê vê "cemiyet"ê de bi Tirkî ev xeber heye:

Kürd Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti

"Vê dawiyê bi vî navî (bi navê Kürd Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti-N.M.) komeleyek hatiye damezrandin ku ji serok, mezin, rojenbîr û birewerên Kurdan pêk hatiye. Em hêvî dikin ku di programa xwe ya qedirbilind û pîroz de biserkevin".

Jîn û Hemze Begê Muksî

Di hejmar 36.a rojnama Jînê de derheqê "şehîdbûn" a Hemze Begê Muksî de jî xebereke balkêş heye. Di rûpela duduyan a vê hejmarê de bi navê "Bir Şehid-i Millet" (Şehidekî Miletê) nivîseke dirêj li ser vî meselê hatiye nivîsîn.

Li gor vî nivîsê, Hemze Begê Muksî, berî serhildana Bedlîsê ya 1914'an li vî navçeyê xebateke ciddî kiriye. Bi komela Hêvî'yê (ya ku di 1912'an de Îstenbolê hatibû damezrandin) re têt kiliya wî hebûye. Hemze Begê Muksî, sal û nîvek berê, dema ku çûye Kürdistanê, li Mêrdînê bi îddîaya "xayîtiya bi welêt re" hatiye girtin. Ji ber ku wî li Mêrdînê di xanekê de weha gotiye: "Dema ku hemû milletên dinyayê heqên xwe bistînin, çima Kurd ji prensîbên Wilson fêde nebînin?"

Piştî ku Hemzeyê Muksî hatiye girtin, îşkence lê kirine û şandine Hepixana Diyarbekirê, li wir jî ceza îdamê danê.

Di vî nivîsê de nivîskar pesnê welatperweriya Hemze Begê Muksî dide û jî bo xebere "şehîdbûn" a wî xemgîniya xwe îfade dîke. Lê em dizanin ku xebere şehîdbûna Hemzeyê Muksî¹⁴ rast derneket û wekî ku rojnama Vakit, li Îstenbolê di 29.5.1925'an de di-nivîse, ew dema serhildana Şêx Seîdê Pîranê cardin tê girtin. Xebere rojnama Vakit (29.5.1925) weha ye:

Berpîrsiyarê Jînê li mudiriyeta polîs

"Çar pînc kesên ku navên wan li Şark İstiklal Mahkemesi (Dadgeha İstîqlal a Rohelatê) mewzû-behs bûn, ji alî mudiriyeta polîs ve hatin tewqîf kirin. Di nav wan de Seyîd Hemze Efendî jî heye ku li Omerlî'yê (qezayeka Mêrdînê) ye ku Kurdî jê re Mahsert dibêjin-N.M.) mamosta ye û berê jî berpîrsiyarê rojnama Jînê bû. Li gor texmînan dê wan bişînin Diyarbekirê."

Di sa di rojnama Vakit (14.6. 1925) de xebereke weha heye:

Seyîd Hemze dişînin Diyarbekirê

"Berpîrsiyarê rojnama Kurdî, Jînê, Seyîd Hemze çend roj berê hatibû girtin. Van rojana dê wî bişînin Diyarbekir İstiklal Mahkemesi (Dadgeha İstîqlal a Diyarbekir)".



Di vî hejmar 36.a rojnama Jînê de li ser "şehîdbûn" a Hemze Begê Muksî, bi navê "Şehîdê Kurdistan" şî'reke 'Evdirehîm (Ebdurehîm) Rehmî heye. 'Evdirehîm Rehmî bi qasî rûpeleke rojnama Jînê tabloyekê lêkerên (fî-lên) Kurdî û Tirkî jî li gor dem (wext)ên wan amade kiriye û ew tablo hatiye weşandin. Li ser vî tabloyê tarîxa 1 Tirmeh 1336/1920 heye û dîsa li ser wê bi Kurdî û Tirkî weha hatiye nivîsîn: "Diyariyek e ji bo zaruyê Kurdan-Kürd gençlerine bir hediye".

Nivîsên hejmar 36.a rojnama Jînê ev in:

- Pîrozî
- Pîroziya 'Eyda Remezanê
- Otonomiya Kürdistanê-Hizañzade Kemal Fewzî
- Maddeyên Peymana Aşitîyê ya ku ji alî Meclisa Bilind a Aşitîyê Teblîxî Tirkîyê bûye
- Belaxetnameyê 'Edeletê
- Kürd Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti
- Li hember fersenda jidestçuyî
- Şehîdekî Milletê
- Ji bo Welat-Zaxoyî
- Şehîdê Kürdistan-ji mala He-kariyan 'Ebdurrehîm Rehmî

Ji van nivîsan "Pîroziya 'Eyda Remezanê", "Ji bo Welat" û "Şehîdê Kürdistan"ê bi Kurdî ne, nivîsên din bi Tirkî ne.

Li gor ku di rojnama Jînê de hatiye diyarkirin ji nivîsa Kemal Fewzî ya bi navê "Kürdistan Muhtariyeti" (Otonomiya Kürdistanê) 100 rêz hatine derxistin. Îhtîmal a mezin ew e ku ji ber san-surê weha bûye.

Li gor ku ji hin belgeyên resmî tê fêmkirin, li Kürdistanê belavkirin û xwendina rojnama Jînê ji alî dewletê hatiye qedexekirin. Mesela di 21'ê Kanûnî sanî 1920'î de waliyê El'ezîzê jî Wezîrê Daxilî re raporek şandiye. Di vî rapore de hatiye nivîsîn ku Waliyê El'ezîzê jî muteserrifê Dêrsimê re

Kemal Burkay:

"Li Kurdistana Tirkîyê, di roja îro da bo yekîtiya hêzên welatparêz, ez ji bin banê TEVGER'ê pê da rê nabînim"

Heval Mîrza Bextiyar li ser hin pirsan bi Sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkîyê heval Kemal Burkay re di 2.9.1988'an de hevpeyvînek çêkir. Lê ji ber hevpeyvîna Umer Şêxmûs dirêj dom kir, me mecal nedît ku wê zûtir çap bikin. Ji ber vê yekê em ji heval Kemal Burkay û ji xwendevanên xwe uzrê xwe dixwazin.

Armanç: Berêz Kemal Burkay, piştî Serîhildana Dêrsimê, hetanî salên 1960'î li Kurdistana Tirkîyê bê dengiyekê dom kir. Lê ji salên 60'î û bi şûnda fikrên welatperwerî li Kurdistanê geş bû û heta îro jî her ku diçe xurttir dibe. Mîrov dikare bibêje ku piraniya rêxistinên me yên îro her çiqas di salên 70'î de hatibin damezirandin jî lê hîmên xwe yên esasî jî geşbûna salên 60'î stendin û bi pêşkêşiya kadîrên wê demê hatine damezirandin. Tu ne tenê şahidekî nêzik, her wiha xwediyê roleke aktîv yê wê demê ye jî. Bi dîtina te tevgera Kurd merhelek tabî jiya, ya na? Heger merhelek tabî ne jiya, çi faktor bûn sebeb û asteng û bi çi hawayî tesîr li ser tevgera Kurd kir?

K. Burkay: Tevgera gelê Kurd dijî zulm û neheqiyê, bo rizgarîyê, ta ji destpêka sala 19 heya îro -ango nêzî dused sal- rêyeke dirêj hat.

Xuyaye ku, di tevgera neteweyî da du aliyên bingehîn hene ku şerê hev dikin. Yek hêzên welatparêz in, bi gotineke din, gel bi xwe ye. Ew li dijî zordestî û ked-xwarîyê, bo rizgarîyê şer dike. Aliyê din dijmin e, hêzên zordest in ku dixwazin hukmê xwe û ked-xwarîya xwe bidomînin. Tevgera neteweyî gora hêz û firsendên van herdu aliyên bi rêva diçe û rewşa ku ew tê da cî digre objektîf e.

Derengketina roja azadîyê bo gelê Kurd jî giranî û dijwarîya vê rewşê pêk tê.

Li pêş gelê me dijwarîya mezintir ev e ku, welatê me berê di navbera du împaratorîyên mezin da parçe bûbû, piştî Şerê Cihanê yê Pêşîn jî ket bin bandûra çar dewletan. Doraliyê welat bi wan girtî ye. Ji ber tesîr û rola wan li Rojhilata Navîn, hêzên navnetewî yên pêşverû jî bi awayekî êşkera û xurt piştgirîya gelê Kurd nakin.

Divê hêzên welatparêz rewşa hanê tim li pêş çav bigrin û gora wê jî xwe ra stratejîyekê hilbijêrin. Ew jî siyaseta yekîtiyê û piştgirî ye bi hêzên pêşverû û welatparêz yên van çar welatan. Gelê Kurd tenê bi vê siyaseta dikare xelesa zulm û zordestîyê li dor xwe biçirîne. Qedera me bi qedera van gelan û şoreşa me bi şoreşa van gelan ve bi xurtî girêdayî ye.

Astengek mezin jî li pêş tevgera gelê Kurd bend û qeydên sazûmana kevn a fêodalî bû. Ferqên dîn, mezheb û eşîrtîyê, her usa jî şextî û axatîyê rê nedan ku gel bi fi-rehî hişyar be û hêzên xwe kom bike. Dijmin jî van dubendîyan û bend û qeydên

kevn gelek îstîfade kir û hîn jî dike.

Her usa jî, dijmin, xasima dewleta Tirk xudî tecrubeyek mezin e. Ew, ne tenê bi zulm û zordestî wek girtin, lêdan, qirkirin, nefîkirin û hwd., bi fend û fêl jî cehd dike ku tevgera Kurd bikişîne rêyên şaş, parçe bike û hêzên welatparêz berde hevdu. Xasima, di van 10 salên dawî da, ger tevgera welatparêz li Kurdistana Tirkîyê parçebûyî ma, firsend da êrîşên dijmin yên dijwar, tevî şaşî û kêmasiyên tê da, hêzên welatparêz, para kiryar û planên dijmin jî ne hindik e.

Helbet, dijmin dijmin e û çî ji dest tê dike. Ger em jî hoste û jêhatî bin, xwe jî şaşî û xeletîyên mezin biparêzin, plan û fêndên dijmin jî bibînin û pûç bikin. Hingê em dikarin zora dijmin bibin.

Armanç: Li Kurdistana Tirkîyê bîyî PDK, hemû partî û rêxistinên ku piştî salên 1970'î hatine damezirandin nuxtake wan a balkêş û muşterek heye; ku van partî û rêxistinên, gişên wan jî bi navê Marksîzm-Lenînîzmê derketin ortê. Gelo ev yek bi çi rengî -him negatîf û him jî pozîtîf- tesîr li ser tevgera Kurdî kir? Her wiha Marksîzm-Lenînîzm li welatê me bi carê de berfireh bû û bi hezaran "kes"î jî xwe re gotin Marksîst û Lenînîst. Lê piştî derba 12'ê Îlonê îcar jî gelek "kes" li çewtîyên Marksîzm-Lenînîzmê "varqîlîn" (yanî pê hesîyan). Gelo mirov dikare bibêje ku Marksîzm-Lenînîzm li welatê me hatiye îdrak kirin?

K. Burkay: Bi raya min, meriv nikare bêje ku, ew partî û rêxistinên teze xwe di salên 70'yî da nişan dan, hemû jî bi navê Marksîzm-Lenînîzmê derketin ortê. Lê rast e, her ku çû hemûyan jî xwe bi vî rengî nişan dan. Ew bi aliyekî tişteki baş bû û bilindîya êtîbara sazûmana sosyalîstîyê û îdeolojîya Marksî-Lenînîyê nişan dide. Lê tişteki din heye, ne rêxistin, ne jî meriv tenê bi gotin nikare bibe Marksî-Lenînî. Sosyalîzma îlmî him bi bir û bawerî, him jî bi kar û xebat kompleks e, pir cîhetên xwe hene ku divê bawerî û kirinên mirovan û rêxistinên jî li gora wê be.

Bi raya min, bingeh, kadro û îdeolojîya piraniya wan rêxistinên bûrjûwazîya piçûk bû. Û wan nexweşîyên xwe jî anîn nav refên çep. Bona vê yekê bû ku çepîtî(sectarî) xurt bû, her yekî bi aliyekî va dikîşand û di navbera hêzên welatparêz da cepheyek, an hevkarîyek çênedibû. Ji wê bû ku, hin ji

wan têrora ferdî û heya dijmin jî li wir hiştin û şerê hevdu kirin. Kiryarên han xelk, kesên xebatkar, pêşverû û welatparêz aciz dikir û ji tevgerê dûr dixist. Hîn jî, bi navê "şerşerî û welatparêzîyê" kirinên han û zirarên han hene.

Ewên ku berê, xwe Marksîst-Lenînîst dihesibandin û piştî 12 Îlonê, bi gotinên xwe, bi "çewtîyên" Marksîzm-Lenînîzmê "hesîyan" û jê dûr ketin, bi raya min, ew berê jî bi rastî ne Marksîst-Lenînîst bûn. Bawerîyek wanî bi dil û can tune bû û di vê rê da ne cêribayî bûn, ne piyyayî bûn.

Helbet, ger 12'ê Îlonê nebaya û hukmê faşî nehata jî, dîsa perçabûn, qetandin, yek bi yek ji tevgerê dûrketin wê çêbaba. Bo partî û rêxistinên ev tişteki tabî ye. Hîn kes bîhnteng in, dûr û dirêj sebra wan tune. Hîn kes hember zehmetan dîyax nakin, li rehetîya xwe dîgerin. Şaşî û xeletîyên partîyan jî helbet tesîrekê li ser kadîrên wan dike. Ew wexta hişyar bin û bibînin ku rêxistinên wan şaş e, rêyeke xelet dide ber wan, tişteki tabî ye ku jê vedîqetin.

Lê meriv nikare ku li kesên han, an jî li komik û rêxistinên han binhêre û bêje "hîn li welatê me Marksîzm-Lenînîzm ne hatiye îdrak kirin". Na, partî û kesên ku Marksîzm-Lenînîzmê baş dizanin û xudî bir û bawerîyek xurt in û di vê rê da bi dil û can kar dikin di Kurdistanê da jî heye. Em li vê dinyayê dijîn û him kêmasî, him jî hejrayîyên vê dinyayê li welatê me jî tê dîtin.

Armanç: Heşt salên dîktatorîyê qedîya. Ev dîktatorîya kolonyalîst bi zulm û zorê û bi hemû dezge û îmkânên xwe ve li dijî tevgera Kurd bi organîze ye û bi viya re jî depolîtîzasyonê xurt dimeşîne. Piştî hewqas bûyer û tecrûbe, bi ya te divê mirov bi mesajek çewa here vî qirnê (cîlî) nuh?

K. Burkay: Sazûmana kolonyalî -piştî 12 Îlonê, her usa jî faşî- di van salan da xwest tevgera gelê Kurd -her usa jî tevgera gelê Tirk ya çep, pêşverû- bi temamî jî ortê hilîne. Lê ew daxwaz îlluzyon (xem û xeyal) bû. Ji ber ku, heya gel bi xwe jî ortê hilneyê, tevgera wanî pêşverû jî hilnaye. Bona vê yekê ye ku hukma faşî û kolonyalî ne gihişt a armanca xwe. Pirsya Kurd îro li welat û li dinyayê jî her wextê zêdetir tê qisekirin. Xelkê tirsîyayî jî nuh ve û bi xurtî bi siyaseta mijûl dibe.

Daxwazên me yên bingehîn di programa

me da hatiye nivîsandin: Em Kurdistanek azad û demokrat dixwazin û bo wê kar û xebat dikin.

Îro û di dema nêzik da mesaja me ji gel ra çibe? Xuyaye em bi tena xwe û di demeke kurt da nikarin zora dijmin bibin. Divê em û hemû hêzên pêşverû, şoreşger û demokrat yên gelê Tirk dest bidin hev. Û gava pêşîn demokratî ye.

Divê em, him ji bo xwe, him ji bo hemû kesan demokratî bixwazin. Berî her tiştî, bila eşkerekirina bir û bawerîyan, bila rêzbûn serbest be. Hemû kes rayên xwe bê ceza û bê tirs bêjin. Bila komelên xwe bi serbestî ava kin. Bila lêdan û tade rabe, zîndan ji girtiyên siyasî vala bin.

Demokratî çiqas ji gelê Tirk ra lazim e, du qatî zêdetir ji gelê Kurd ra lazim e. Ger em şoreşger in, şoreşa neteweyî û demokratî û pişt re ji sosyalîzmê dixwazin, demokratî ji me ra pir hewce ye. Ew rê û olaxên bo têkoşînê, rê û olaxên gelek heja dide dest me.

Ger hêzên welatparêz û pêşverû yên Kurd û Tirk dest bidin hev, dikarin zora sozûmana kevnepereşt bibin û demokratîyê bînin welat. Demokratîyek fireh rê li ber şoreşê vedike. Ji bo vê ye ku zordest û kevnepereşt ji demokratîyê rastî ditirsin, heq û azadî ye nadin xebatkarên û gelê Kurd.


Ango bi kurtî, mesaja me divê ev be: Yekîtiyê û demokratî. Ev mesaj di vê demê da dikare piraniya gelê Kurd û Tirk li dor xwe kom bike û berê wan bide sazûmana zordest.

Armanç: Wek ji me hemûyan ve jî xuyaye, piştî tevgera Kurd ji cûnta faşîst derbe xwar, rêxistinên me qels ketin. Di van heşt salên dawî de -ku mirov kare bi dewra "têkçûnê" bi nav bike- gelek milîtan û kadîrên rêxistin û partiyên Kurd ji tevgerên xwe veqetîyan. Ji wan hin bi serê xwe man, hinan jî rêxistinên piçûk li gora xwe ava kirin. Gelo ev yekê mirov kare tenê bi bêbawerîyê û çewtîyên wan kesan, yan jî bi xeletî û ne şarezatîyên rêxistin û partiyên me girê bide?

K. Burkay: Na, meriv nikare vê yekê tenê bi kêmasiyên wan kesan, yan jî bi kêmasiyên partî û rêxistinên wan girê bide.

Di 5-6 salên berî 12 Îlonê da li welat tevger bilind dibû, tevî wê jî gelek kes hişyar dikir û dikşande nav refên xwe. Dema tevger bilind dibe, kêmasî û şaşiyên heyî jî baş nayên dîtin û pirs û problem di nav partîyan da kêman in. Lê dema di bin êrîşên dijmin da tevger şûnda dikîşe yan dadikeve (wek piştî 12 Îlonê) him kêmasî û şaşiyên heyî baş xuya dikin, him jî -di vê tengasiyê da- pirs û problemên nû serî didin.

Helbet, ger 12 Îlonê nebaya û hukmê faşî nehata jî, dîsa perçabûn, qetandin, yek bi yek ji tevgerê dûrketin wê çêbiba. Bo partî û rêxistinên ev tişteki tabî ye. Hîn kes



K. Burkay: 'Di welatê me da jîyaneke nû wê dest pê bike. Jîyaneke nû ku bi sedan sal e, bi hezaran sal e gelê me li hêviya wê ye.'

bihnteng in, dûr û dirêj sebra wan tune. Hin kes hember zehmetan dîyax nakin, li rehetîya xwe digerin. Şaşî û xeletiyên partîyan jî helbet tesîrekê li ser kadrên wan dike. Ew wexta hişyar bin û bibînin ku rêxistina wan şaş e, rêyeke xelet dide ber wan, tiştêkî tabîî ye ku jê vediqetin.

Ango xuya ye ku, di parçebûnê da, dev ji şoreşgeriyê berdanê da tesîra van tiştan hemû heye. Lê piştî 12 îlonê, sedemên bûyerên han bi giranî rewşa dijwar e ku ji êrîşên dijmin pêk tê. Ango sedemê bingehîn şertên objektîf in.

Armanç: Piştî tecrûba UDG û HEVKARÎyê 8 hêzên Kurd hatin cem hev, TEVGER'ê ava kirin. Ji TEVGER'ê çi hêviyên te hene? Ji bo ku tevgera Kurd xwe ji belavbûnê xelas ke û xwe bide ser hev, bê guman TEVGER'ê destpêkek girîng e. Derveyî TEVGER'ê gelo tu riyên din jî hene?

K. Burkay: Li Kurdistanê Tirkîyê yekîtîya hêzên welatparêz (wek hevkarî yan jî cephe) şert bû û Tevger jî yê yekê pêk hat. Wekî gotina we, çêbûna TEVGER'ê destpêkek e û girîng e. ew gaveke pêşîn e, di-vîyabû bê avêtin. Lê tiştêkî xuyayî ye ku, tenê ew gav ne bes e. Divê ev destpêk bê xurtkirin, bi rêva biçê, bawerîya gel bistîne û xelkê li dora xwe kom bike, goşt û can bistîne. Ger, hêzên ku ev yekîtî pêk anîn, bi berpirsariyê karê ku dikeve ser milên wan pêk binin, zû bêzar nebin û teşqelê dermexînin, dikarin ber bi armanca xwe pêşva biçin.

Li alî din, rê dirêj e û jê ra zeman lazim e. Divê em bihteng nebin û di demeke kurt da pir tiştan hêvî nekin, angu li benda mucîzeyan nebin.

Li Kurdistanê Tirkîyê, di roja îro da bo yekîtîya hêzên welatparêz, ez ji bin banê TEVGER'ê pê va rê nabînim. Ew rêxistinên dinê ku bo tevlêbûna TEVGER'ê hatibûn vexwendin, divê ew jî rojekî berê bîn tevlê bibin û wê xurttir bikin. Yên ku di

rûbarî şaşî, xeletî û xirabiyên xwe li der yekîtîyê mane, divê ew jî siyaseta xwe rast bikin, da ku TEVGER di rojên pêşî da hemû hêzên welatparêz bigre nav refên xwe.

Armanç: Di rewşa îro de girêdayî TEVGER'ê yan jî li derveyî TEVGER'ê mirov dikare hin muessesên netewî ava bike? Mesela, wek yekîtîya xortan, li Ewropayê federasyonê ku hemû karkir û muhacîrên Kurd di bin bandora xwe de topke, derxistina kovar û rojnameyên muştêrek, fonêk jî bo girtîyan û h.w.d.

K. Burkay: Derxistina kovar an rojnameyê muştêrek, jî xwe di programa TEVGER'ê ya zûtîrîn(acil) da heye û niha hazîrîya wê dibe. Pêkanîna yekîtîya karker û macîrên Kurd di bin banê federasyonê yan konfederasyonê de jî di nav armancên TEVGER'ê da ye. Lê jî bo vî tiştî, divê komel û federasyonên heyî rûnin û vî karî bi awayekî demokratîk di nav xwe da safî bikin. Angu di vî karî da TEVGER dikare alîkarîya wan bike.

Ji bo rêxistinên civakî yê din jî raya TEVGER'ê usa ye. Ango daye pêş xwe ku yekîtîya komelên xortan, jinan, toxtoran, nivîskarên, sinetkarên pêk bîne; ger ev komel tunebin, yan jî cîyê ku tunin, wan ava bike. Her usa jî, daye pêş xwe ku derheqê heqên mirovî û aşîtiyê da komelan ava bike.

Rêxistinên hanê, helbet, dibê serbixwe bin. Lê ew dikarin tevî TEVGER'ê bibin û divê tevlê bibin jî.

Armanç: Dema mirov hûr bal û dîna xwe dide rêxistinên me, wek nêrîn û program û heta di politîka rojane de jî gelekên wan nêzikî hev in; yan jî bi kêmasî, yê pirr nêzikî hev hene. Bi ya te, zemanê yekîtîya sosyalîstên Kurd hîn nehatiye gelo? Tu wek serokekî sosyalîst di vî warî de çi mesûliyetê li

ser milê xwe dibîni? Bi dîtina te, hin ferqiyetên programatik ji bo yekîtîya hêzên sosyalîst astengek pirr mezin e? Û jî bo rakirina van "ferqiyetan" îro mirov dikare çi gavê bavêje?

K. Burkay: Di warê îdeoloji û programê da di navbera partîyan da ferqên piçûk hene, yê bingehîn hene. Meriv dikare ferqên piçûk li hev bîne, yan jî wan bide alîkî. Ji ber ku, tiştê han di nav partîyêkê da jî dibin. Lê ferqên bingehîn, ger

Di warê îdeoloji û programê da di navbera partîyan da ferqên piçûk hene, yê bingehîn hene. Meriv dikare ferqên piçûk li hev bîne, yan jî wan bide alîkî. Ji ber ku, tiştê han di nav partîyêkê da jî dibin. Lê ferqên bingehîn, ger jî ortê ranebin, rê nadin yakîtîyeke Marksî û Lenîni. Ango divê li ser meseleyên stratejîk ray yek be.

jî ortê ranebin, rê nadin yakîtîyeke Marksî û Lenîni. Ango divê li ser meseleyên stratejîk ray yek be.

Lê çêbûn û programa TEVGER'ê mîsaleke baş e. Ango hêzên welatparêz êdî dikarin li ser gelek tiştên girîng gotina xwe yek bikin, programeke miştêrek bidin pêş xwe. Kar û xebata miştêrek, şik tune wê wan zêdetir nêzî hev bike. di rewşeke hanê da, helbet, yê ku bi nêrîn û program zêdetir nêzî hev in û sosyalîzmê dixwazin, dikarin li pîrsa yek partîyê jî bifikirin. Pêkanîna yekîtîyeke firehtir û xurttir, helbet dibe qezenceke mezin bo sosyalîstên Kurd.

Armanç: Van du salên dawî hin fikir û pêşniyar jî hin partîyên

**Kurd hatin; wek avakirina otorî-
teyek netewî ku karibe her çar
parçê Kurdistanê temsîl bike. Dîtina
te li ser vê pêşniyarê çiya?**

K. Burkay: Partiya me jî, ji sala 1980 heya îro bi vê pîrsê mijûl bû. Me dixwest qe nebe di destpêkê da komîteyêke piştgirî û koordînasyonê di navbera herçar parçeyan da pêk bê. Di vî warî da, wekî hûn jî dizanin, gelek civîn û xebat jî hat kirin lê dawiyê tiştêk jê dermeket. Ev kar sar bû û sekinî. Organek netewî ku bikare tamamîya hêzên welatparêz ên Kurdistanê temsîl bike tiştêkî baş dibû. Xelkên biyanî jî pîrcaran ji me ra dibêjin: "Hûn Kurd belawela ne, yekîtîyêk we mîna PLO tune.."

Ev rastîyêke objektîf e, lê pir mixabin, di rewşa hanê da jê ra çare dîtin jî zehmet e.

Hemû kesan ra eyan e ku şerê Iraq-Îranê da Kurd jî bûn teref. Yê ku welatê me perçe kirine, li pêş yekîtîyê hêzên welatparêz jî asteng in. Hin partî, bo protestokirina çekên kîmyevî jî nayên ba hev. Hin balyozxana Iraqê protesto dikin, ji yê Îranê ra dibêna na... Hin jî ziddî wê dikin.

Ew kar di demeke kurt da safî nabe. Divê berî hertiştî di her parçeyî da yekîtîya hêzên welatparêz pêk bê û di navbera wan da pêwendiyên baş hebe, piştgirîya hevdu bikin û pêwendiyên xwe pêşve bibin, da ku gavên pêştir bikaribin bavêjin.

Armanç: Di sala 1984'an meha Çileyê Pêşîn de partiya we jî di nav de, 6 partîyên şoreşger ên Kurd û Tirk bi hev re hevkarîyêk bi navê Yekîtîya Çep ava kirin. Di dawîya 1987'an de Sekreterê Partiya Komunîst a Tirkîyê (TKP) Haydar Kutlu û Sekreterê Partiya Karkir a Tirkîyê (TİP) N. Sargın bîyî ku haya Yekîtîya Çep bigihîne vegeriyan Tirkîyê û hîn jî girtî ne. Piştî vegera wan, Partiya Pêşeng a Karkerê Kurdistan (PPKK) rexne li şiklê vegera wan her du sekreteran girt û jî Yekîtîya Çep daxwaza avêtina wan kir; gotin ew înkara Yekîtîya Çep e û loma jî divê her du partî bîn avêtin. Lê piştî ku daxwaza PPKK nehat qebûl kirin, ew jî Yekîtîya Çep derketin; lê hûn hîn endamê vê yekîtîyê ne. Li ser Ye-kîtîya Çep, vegera H. Kutlu û N. Sargın û derketina PPKK ji Yekîtîya Çep dîtina te çiya?

K. Burkay: TKP û TİP'ê di nav xwe da yekîtî pêk anîn, siyasetek nû danîn pêş xwe û herdu sekreterên xwe jî bo avakirina partîya nû (TBKP) bi şiklekî eşkere, şandina welat. Me derheqê vê yekê da raya xwe di Riya Azadî da eşkere kirîye.

Helbet, her partî serbest e ku karê xwe rast bike û siyasetek nû jî daye pêş xwe. Lê herdu partî jî endamên Yekîtîya Hêzên Çep bûn, diviya bû qe nebe vê meselê di yekîtîyê da qise bikin. Her usa jî, heqê yekîtîyê ye ku li rewşa wan binihêre, tiştê ku dikin li gor armanç û programa yekîtîyê ye, yan na.

Lê ew tiştê ku hûn dibêjin, angu pêşniyara PPKK jî bo derxistina TKP û TİP'ê ji Yekîtîya Hêzên Çep, bi şiklekî resmî ne ghiştiye me û di organa da jî ne hatiye qisekirin. Bi şiklekî resmî bihata jî em li dij derdiketin. Heya ku TİP û TKP jê dernekevin û karê ku dikeve ser milê wan bikin, em çima derxistina wan bixwazin? Li aliyê din, pêşniyara PPKK qebûl nebe jî ew çima jê derdikeve? Ger yekîtî hewceye,

"Li Kurdistana Tirkîyê, di roja îro da bo yekîtiya hêzên welatparêz, ez ji bin banê TEVGER'ê pê da rê nabînim"

Destpêk r. 7

divê mirov bo jiyandina wê xebatê bike. Lê ku yekîtiyê edî nemeşe, jîyanîya xwe wînda bike, ew tiştekî din e. Bi raya min PPKK lez kir bo derketinê. Divîya bû rewşa Yekîtiya Hêzên Çep bi her awayî bihata qisekirin.

Armanca: Piştî heşt salan şerê Îran û Iraqê waye li ser sekinandina şer li hev hatin. Li gor vê, wê rewşa Kurdên her du perçeyan jî têkeve merheleyek nuh. Tirsî ma hemû Kurdan ewe ku tarîx careke din "tekerur" bike. di der heqê vê meselê de komentara te çi ye?

K.Burkay: Tirsî Kurdan ne bê sedem e. Navbera Iraq-Îranê da şer sekinî lê li Kurdistanê geş bû. Iraqê bi hemû hêza xwe, bi çekên kîmyevî, bi qirkirin û nefikkirin ajot ser Kurdan.

Di sala 1975 da jî herdu dewlet li hev hatin, lê bi kîsê Kurdan. Gelê Kurd ne dijî aşîtiyê ye, em ji hemû kesan zêdetir aşîtiyê dixwazin. Lê divê aşîtiyê bê welatê me jî. Divê Kurd jî ji agir û şewata şer xilas bin, di welatê xwe da azad bijîn. Lihevhatinek ku heqê Kurdan bide alîkî û paymal bike tenê durûtî ye, zordestî ye.

Usa xuya dike ku bi sekinandina şer, cardin rewşa Kurdan dijwar dibe. Lê Kurd dikarin bi berxwedanek camêrî û bi sîyasetek baş jî ve tengasiyê jî derbaz bin.

Divê ji bîr nebe ku, şerê Kurdan bo azadiyê berî şerê Iraq-Îranê bû. Ji nuha û şûnda dibe ku hin alîkarî ji ser wan qut be, lê tiştên dinê jî hene ku alîkarîya wan dike. yek ev e ku, gelên Iraq û Îranê edî ji şer bêzar bûne, ew bi dil naçin şerê Kurdistanê. Ya duwemîn, ji nuha şûnda li Iraq û Îranê pirs û problemên hundur mezin dibin.

Di vê merhelê da, divê tevgera Kurd him li welatê xwe bişidîne û li ber xwe bide, him jî li der, di warê navnetewî da, bo heqên gelê Kurd kar û xebatek baş nişan bide.

Armanca: Di van demên nêzik de Celal Talabani çû Amerika, bi hin berpirsyarên Gesra Sipî re rûnişt, pêwendî danî. Li ser vê gerr û têkiliyên Celal Talabani tu çi dibêji? Di van demên dawî da Amerika qala Kurdên Tirkîyê dike û xwe wek piştvanekî wan nişan dide. Tu jî vê ra çi dibêji?

K. Burkay: Çûna Celal Talabani û dîtina wî çend berpirsyarên Amerîkî tiştekî tabîi ye. Ger rê hebin, nûnerên Kurdan welatê derva ziyaret bikin, mesûlên wan dewletan bibînin, pirsî Kurdî bi wan ra qise bikin tiştekî baş e.

Amerîkayê bi şikleki resmî û eşkere behsa Kurdên Tirkîyê û hin heqên wan jî kir, ev tiştekî nû ye û helbet baş e. Amerîka hêzeke mezin e, di serda jî piştgir û hevkarê Tirkîyê ye. Bo vê yekê ye ku serokên Tirkîyê gelek aciz bûn û hêrsa xwe nişan dan.

Ango divê meriv ji dîtina xelkê netirse. Ku îmkân hebe biçe welatên sosyalîst jî, kapitalîst jî, rewş û daxwaza gelê xwe eşkere bike. Lê divê hişyar be jî, bendê xwe nede dest kesî. Xasîma Amerîka û dewletên emperyalîst wek wê, li menfaetê xwe dinihêrin û di şerê rizgarîyê da ne dost in, bi wan bawerî nabe.

Armanca: Nuha li Sovyetistanê, li dewletên sosyalîst gişan û çî bigre hemû partiyên komunîst prestroyka, glasnost û politikayên xwe muhaqeshe dikin. Ji bo sosyalîstên Kurd divê prestroyka û glasnost çi îfade bike? Û ji bo tevgera Kurd, hêzên sosyalîst dikarin çi feydeyê jê bibînin?

K.Burkay: Di prestroyka û glasnostê da gelek tişt hene ku tenê Yekîtiya Sovyet û hin ji dewletên sosyalîst yê dinê eleqeder dike. Wekî, YS daye pêş xwe ku heya sala 2000'î qezence xwe ya neteweyî bigihîne du qatî. Dîsa YS cehd dike teknolojiya xwe nûjen bike û pêşdatir bibe. Ew hemû karên wan in û em serketina wan dixwazin.

Dîsa YS bi glasnostê (eşkeretî) dixwaze demokratîyê li welatê xwe firehtir bike. Usa ku gel jî bûyerên hundur û der hişyar be, ji karê welat ra zêdetir xwedî derkeve, pêşî li şaşî û xeletiyên bîst girtin. Ew jî ji bo sosyalîzmê tiştekî baş e û em vê yekê da jî serketina wan dixwazin.

Ango xuya ye ku, ew hemleya nû ji hewcedariyên Yekîtiya Sovyet pêk tê, civata ku 70 sal e bi avakirina sosyalîzmê mijûl dibe, di vê rê da gelek çûyê û niha jî pirs û problemên nû li pêş in ku divê safî bike.

Eşkere ye ku, bo me û bo partiyên dinê li welatên kapitalîst ev pirs tune ye. Ji xwe, bo demokratîyê jî, heya niha partiya me gora prensîbên Marksî û Lenîniyê kar kiriye. Di refên me da şukur, Stalînek çênebûye! Partiya me da hemû kes dikarin rayên xwe û pêşneyarên xwe bi serbestî bêjin.

Evana hemû karê Sovyet û dewletên sosyalîst in, lê tesîra wan li ser hemû dinyayê û li ser hemû partiyên Marksîst dibe. Wexta ew di vê rê da bi serkevin qîmet û giraniya sosyalîzmê li hemû dinyayê mezin dibe. Ya duwemîn, ew, bo safîkirina hin pirs û problemên civata sosyalîst rê û olaxên nû diceribînin. Divê em jê hîn bin, îro nebe sibe lazîmî me dibe. Ya sêyemîn, ew bi çavekî nû li dîroka Yekîtiya Sovyet dinihêrin, xeletiyên dewra Stalîn û Brejnev eşkere dikin. Divê em jî cardin li zanîna xwe binihêrin, wê jî hin bîr û baweriyên xelet paqîş bikin. Li alî din, dibe ku îro jî hin xeletî bîst kirin; divê em jî lê bîkolînin, em bi xwe jî li rastîyê bigerin.

Her usa jî, tesîra bûyerên YS li derva jî dibe. Siyaseta dervayî bi rengê nû xuya dike. Di rakirina roketên navçemenzîl û kurt da tesîra vê siyaseta nû mezin e. Her usa jî, li gelek cîhên dinyayê, di şer û pevçûnan da riya aşîyê vebû. Wek pirsî Afganîstanê, Namîbya, Kamboçiya, Qibrîs, Iraq-Îran û hwd. Em ku di ciyekî germ wek Rojhilata Navîn da dijîn û bo rizgariya gel û welatê xwe şer dikin, divê van guherînan nû bidin ber çavê xwe.

Armanca: Em te, ne tenê wek Kemal Burkayê siyasetvan, her wiha wek şair û edebiyathizekî Kurd jî dizanin. Rewşa edebiyat û çanda nivîskî ya nuh tu çawa dibînî? Ji bona pêşdebirina vê nêrinên te çi ne?

K.Burkay: Di rewşa bindestiyê da, li hember ewqas astengên mezin, dîsa jî çand û edeba Kurdî-gora perçebûnê- di çend qolan

de ber bi pêş diçe. Ya pêşîn li Yekîtiya Sovyet e. Kurdên wir piçek in, lê azad in. Afirandinên wan serbilindiyek e bo gelê me û bo sosyalîzmê. Ya duwemîn li Kurdistana Iraqê ye. Hember ewqas zordestî û zulm jî, Kurdên wir heya derecekê ji heqên çandî îstîfade kirin, çand û edeba Kurd li wê ber bi pêş gavên baş avêtin. Di nav Kurdên Îran û Sûriyê; da jî karên baş dibin.

Hember ewqas zordestiya mezin jî Kurdên Tirkîyê, di 15-20 salên dawî da gavên baş avêtin. Nuha karên wan li Ewrûpa gulvedide. Bi zimanê Kurdî gelek kovar û rojname, kitêbên weşandin û kasetên mûzîkê dertên.

Ev guhertinek baş e û jîndariya gelê Kurd û dewlemendiya wî bi aliyê moral û çand nişan dide.

Lê ji ber perçebûnê, bindestiyê û tunebûna sazgehên netewî yê çandî (wek unîversîte, dibistan, radyo-telewîzyon û h.w.d.) pirs û problem jî gelek in. Elîfba ne yek e. Diyalekt her diçe dûrî hev dikevin. Safîkirina van pirsan ne karê îro ye, jê re zeman û dewlet lazîm e.

Di gelê wê, di rewşa nivîskaran de-zêtir bo Kurdên ji Kurdistana Tirkîyê qise dikim-du kêmasiyên mezin dibînim. Yek, xwe nawestînin ku vî karî baş hîn bin, çanda xwe fireh bikin; li nav û dengêkî erzan digerin. Ya duwemîn jî, bi navê "yekîtiya zi-

man" û bi navê "bi karanîna zimanê nivîsandinê yê edebî" him gotin û qeydeyên diyalektan tevlihev dikin, him jî, ji zimanê gelê dîr dikevin. Gelek kes hene ku meriv ji nivîsandina wan tiştekî fêhm nake.

Tiştên hanê bi kêrî çand û edeba Kurdî nayê. Divê tiştên ku em dinivîsin bi rehtî bêne fêmkirin. Nivîsandina me, wek xeberdana me ji zimanê gelê dîr nekeve, zelal be. Ji ber ku ku ev hîn destpêk e, xelk nû-nû hîn dibe û divê jê aciz nebe. û bi raya min, di karê nivîsandinê da hêjayî û zelalî bi hevra diçe.

Armanca: Di sala 2000'î de tu rewşa Kurdan çawa texmîn dikî?

K.Burkay: Ji sala 2000'î ra çi ma: 12 sal! Ev ne wexteke dirêj e. Lê dîsa jî, texmîna min ewe ku, di sala 2000'î da him rewşa Kurdan him jî rewşa dinyayê wê gelek guherî be. Ji ber ku, di dema me da guhartin gelek bi lez çêdibe.

Bi raya min, heya sala 2000'î Kurd jî wê bigihên azadî û aşîtiyê. Qe nebe, di yek-du parçeyî da ev rê wê ji bo Kurdan jî vebe. Di welatê me da jîyaneke nû wê dest pê bike. Jîyaneke nû ku bi sedan sal e, bi hezaran sal e gelê me li hêviya wê ye. Bawerîya me ev e û em bo vê armancê şer dikin. □

Armanca me pêwîste bibe avakirina Kurdistanek serbixwe

Zekî Seyda

Îro wezîfa ewil li pêşîya kes û hêzên pêşverû li her çar perçeyên Kurdistanê û temamê Kurdên welatparêz; avakirina Kurdistanek serbixwe û demokratîk e.

Sekreterê Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan Celal Talabani li ser navê Cepha Kurdistana Başûr di Televîzyona Swêd de axaft û wiha got: "Emê hêzê pêşmerge bikin yek û ordiyekê damezirînin. Armanca me jî avakirina Kurdistanek serbixwe û demokratîk e.

Bi a min axaftin gelek di cî de bû û gawek gelek pêşve bû. Hêzên welatparêzên Kurdistana Başûr piştî hewqas qetliam û têkoşîn, bi temamî gihîştin vê netîcê ku otonomî edîjî wan re nabe xelasi. Yek rê jî wan re maye; avakirina Kurdistanek serbixwe û demokratîk e. Îro wezîfa ewil li pêşîya temamên hêzên Kurdistanê yê li her çar perçeyan, piştîgirîya vê armancê bikin. Bi qeweta xwe ya siyasî, eskerî û aborî, bi her hawî.

Ez dixwazim li ser hin bûyerên ku hin kesan, an hêzan dudil bike bisekînim.

Dibe ku hin kes, an hêz bêjin, Kurdistana başûr perçeyekî ji Kurdistanê biçûk e û nufûsa wê jî û erdê wê jî hindik e. Ji bona avakirina dewletek serbixwe destnade.

Bi a min ev bawerî ne di cîde ye. Îro li ruyê dinê, ji vî perçeyê Kurdistanê pîrr biçûktir bi dehan dewlet li ruyê dinê hene.

Îro bi hezaran merivê gihîştî (Kurd) li welatê Ewrûpa, an jî li

welatên din dimînin. Ez bawer im gava îmkânêk weha jî wan re peyda bibe wê bi dil û can vegertin welatê xwe û ji bona pêşketina welatê xwe wê bixebitin.

Heta îro, di serida Yekîtiya Sovyet û welatên sosyalîst piştîgirîya xwe bi gelê Kurd re nişan nedane û qetliamên Seddam protesto nekirine.

Ev bûyer dibe ku hin kes, an hêzê sosyalîst dudil bike; gelo avakirina dewletek serbixwe, di rewşa îro de wê ji emperyalîzmê re nebe alet. Ev bûyer wan dudil bike û nehêle jî dil û can ji bona vê armancê (avakirina Kurdistanek serbixwe û demokratîk) têkoşînê bidin.

Berîya her tiştî ez vêya bêjim avakirina dewletek serbixwe û demokratîk li kîjan perçeyê kurdistanê dibe bila bibe, ji bona me Kurda heqekî insanî û demokratîk e. Tewrê dewletên sosyalîst jî gere li gora vê prensîbê be. Gava ne li gora vê prensîbê be (ku îro ne li gora vê prensîbê ye) bila ew bifikirin, ne em.

Cardin bêjim; îro wezîfa ewil li pêşîya kes û hêzên welatparêz li her çar perçeyên Kurdistanê û temamên kurden welatparêz; avakirina Kurdistanek serbixwe û demokratîk e li Kurdistana Başûr. Lazîme bi temamê qeweta xwe (siyasî, eskerî, aborî) ji bona vê armancê bi dil û can têkoşînê bidin. Tu tiştêk îro ve armancê paşve naxe. □

helbest helbest helbest helbest helbest helbest helbest

-Ji Kovara Armanç re-

Helepçe

Salihê Heydo

Hijdê meha Adarê çî rojek pîrr ne xweş bû
J'destpêka sibê de ewrekî tarî û reş bû

Qet-qet û bi gulbe çû û hatî, girtibû hev
Wek mij û dumanê girtibû ruhni û kir şev

Pêkhatî ji kîmya tev dibû şelpe û sîwan
Kar bûbû ji boyî kuştina xelkên Kurdistan

L'ezmanê Helepça min civibû bi qet û kom
Nişana belê bû pîrr kirêt û pij bû wek bûm

Teyrok û birûsk, bagij û ba û him ji taloz
B'şingîn û bi şerqîne di rengê tav û bahoz

Tiştên kes nedîtî ku bi xurtî tene xwarê
Bumbeyên giran xerdel û gazên bi jehrê

Kardyan û sîyanîd in, digel tabun û fosgen
Asîta hişin û losteya lerz û di şewşen

Narincên di fosforî û şelpayên di mêrkuj
Talanê didin qadê ji hesû tîn bi guj-guj

Reşxêzên xwe berdane bi pencên hov û hirça
Tev hatine xwarê, ew li bajarê Helepça

Nişek ji mirovan bo xwe dîna bû bi armanç
Pismam û bira ne, tev kes û kûsên di Kurmanç

Kewtek din ji gelê me bûye gorî qurban
J'barê Helepça, ew Helepça pir perîşan

Agir dikete nav cegerê zerya û bûkan
Qijîn radibû bi xurtî ji ser zarê biçûkan

Kolan û zikakên vî şehre me'yê rengîn
Bû gagurûxane, ey bira tê da nema jin

Şilan û şilêrên ku li derdorê ewî bûn
B'ser hev de kumîştin, ji berêve çilmisî bûn

Sed-sed li kuçan hişk bûne zarok û di colang
Cendek û kelaxê gelê Kurd in, mane bê bang

Li wê derê kalek ketiye, bê deng û pêjin
Hişk bûne li vê de bi tevayî çend keç û jin

Dapîrek li wê de çend nevi çirk kirine himbêz
Bapîrek li vê de şel û şete maye bê hêz

Mindalekî din digrî li wê de maye sêwî
Kokimkî di matbûye li vê de ka kurê wî

Dergûşek di pêsîrê de, dev nuh şirdimêji
Nuhrîne biçûkan dayika wî jêr dibêji

Porsorek li wê hêlê nema kezîyan dihûne
Tîpên di jin û jindariyê nema dixûne

Pisîka li ber dergahê asîtanê hundir
Hişk bûye di gel çelê xwe, ew ji bûye kevîr

B'vî rengî xuyane, bê gîyanin tev mirî ne
Laşê di wana sax e û bê derb û birîn e

Meydan û şeqam, gastîn, hemî rûbarê xwînî
Cihan ji bi carek kor e, ew nema dibînin

'Eyane ji ber gazê ezim îro digazim
Alem çilo pê, kerr bûye, ez vêya nizanîm?!

Hijmara pelise û şîdan, deh hezar in
Sed heyf û mixabin ku ji xelkê ve ne diyar in

Filmê ku rejîma Eflaqî j'bona me kêşa
Qet nayê salixdanê bi ayin û kilişa

Qezya ku bi rê bûye li vî bajar û xakî
Bû rengê Hiroşîma û şarê Negezakî

Ket rêza Ciwanrû, Geliyê Zila, Qoçgirê
Nasîne dide xweş Qelhediz û Qewmezêrê

Tiştê ku te kiriye, ey Seddamê hov û mexser
Negihîştê, ne Hulagû, ne Musolînî û Hitler

Bokasa ji wê dûr bû, ne dîna bû Somoza
Qet holê nekir Îdî Amin û Berberoza

Xazoqên Dirakulayê Romanî ne wa bûn
Na-na qet ne şaş im ez ebed ney ji Qelawûn

Sed qatî xerabtir kiri ji Neronê tawankar
Diroka cihanê nanî kes wek te sitemkar

Xinzîrê diranqîlî, tu goştîxwarê mirovan
Jîna te kin e zanibe Ferzendê hovan

Dîrokê tu çemkiriye, hezar nalet li ser te
D'qonaxa sedê bîstan tu sembola faşîst e

Hecacê Iraqê, xwînxwarê laşê Kurdo
Wan zara gunehkarî çibû ey lawê Fîndo

Devlokê beyabanê û qurtê kelexanî
Sed carî tifû bêtin li wê roja tu anî

Darçeka bi destê Mîterand û Reagenî tu
Hevsarê bi dest Şamîr û hem ji Begîni tu

Dehakê sedê bîstan xweş li min bibî guhdar
Bawer bikî ku gelkî nêzîke, da tu bê xwar

Tirba xwe bi destê xwe tu va îro dikolî
Dojeh û ruvîn be li te Cengîzê Moxolî

Nazî ne wisa bû na ebed qet ez ne şaş im
Çêla te bi pîsî ku çiqas bêjim, li paş im

Piştî vê qesebxana çetin dijwar û riswa
Her Kurdek bizot û ar e tene hêrsê Kawa

Zincîra te bestaye li dora Kurd bi yexme
Wê bête şikandin ew bi destê milletê me

Di tarîxêd hebûn û her hene, qet namîrin
em

Ax gidîno, Kurdistanê mij, dûman e,
Ne mij û dûmana roj û salan e,
Lê mij, dûmana dewir û qurna ne,
Tofana Tirk, Ereb û Eceman e...

Ezê dûrim, dûrim war û gelê te,
Dûrim ji roja şayî û şîna te,
Axir, tu dêyî, ez kurê te helal,
Xerîbî dijwar e, diya min a delal!

Of, êtimin, nava axa xelkê da,
hêsirê min weke Ferat dikişin,
Dilê dêşe, ji hidûd derdikeve,
Nizam, ezê gazîne xwe kê bikim?

Loma dibêjim: -Ez dûrim ji diya xwe,
Ji miraz, kul û derdê milletê xwe,
Dilê dayika min kirine çar kera,
Xûna gelê min dikişe her dera.

Faşîstê xûnxwar Tirk, Ereb û Ecem,
Dixwazin xerîta Kurda paqij kin,
Û temîz kin ji ser xerîta dinê,
Lafa, paya bidine xwe û şabin...

Gelî xwînmîja, bizanbin em kî ne?
-Em Kurd diltemîz in û ser bilind in,
Em kok û eslê xwe va Mîdyâ nin,
Em ewlad û kurê Rostemê Zal in.

Em ne dar in, rakîn wêda bavêjin
Û pêsîrê xwe ji me xilas kin,

Şehîdê Helepçê ra

Elîyê Evdilrehman

Kurd şêrê çiya û lehengê behran in,
Em ordiya mêrxas Barzanîyê kal in.

Şer a da her mêrek û jineke Kurda,
Caba sed Tirk, Ereb û Ecema didin,
Çaxê dibe roja daw-dozên giran,
Kurd berdidine we û hûn direvin.

Seddam, te bîr kiriye Barzanîyê mezin,
Tu ser çoka dayî seknandinê,
Tu diketî lavayî û dileka,
-Gidî, nekujin, îd narêjim xûnê...

Te bîr kir sozê dayî, rûviyê fêlbaz,
Te tû kir erdê qirêc, dadilêsi...
Nuha tu bûyî serekê dîwanê,
Gede şerm bike, niha çî dixwazî?

Kurd natirsîn ji mirin û qirê,
Wêrankirina bajar û gunda,
Merem û xwestina gişka; Kurdistan e,
Têda aza bê dengê gelê Kurda.

Hewar e, ha hewar e, reş hewar e,
Beesa nebixêr Kurdsitanê bela bûye,

Dibêjin-faşîstê Seddam Huseyn,
Weke Hitlerê devxûn har bûye.

Ser Helepçê, gundê dor-berê wê da
Bê însaf çeka kîmyayê direşîne,
Hezara Kurdê bê gune qir dike,
Heyfa kevin û teze ji Kurda distîne.

Seddam, tu decalî, aqilkundirî,
Bizanibe, bi wê çekê Kurd natewin,
Ewê dîsa te deynine ser çoka,
Wê heyfê hezar qatî ji te bistînin.

De birano, bav no û dayîkno lêxin,
Revê bi ordiya Seddam Husyn xin,
Şîna giran ser faşîsta da bînin,
Heyfa xûşk birê Helebçê bistînin.

Ez şayîrekî Kurd im û kûr dinalim
Ta sax bim, wê qetla Helebçê
bîr nakim,
Ezê bi şev û roja binvîsim,
Temam dinê wê zulmê bihesînim.

Ax, gidîno, Kurdistanê mij, dûman e,
Ne mij û dûmana roj û salan e,
Lê mij, dûmana dewir û qurna ne,
Tofana Tirk, Ereb û Eceman e...

Lacek û Aslan

Arêkerdax: Oskar Mann

Rojên keyeyêndo koçer, weharê xeymê beno. Xeyma xo zî Qerecedax a beno. Xeyma xo tenya bena. Lacêndê xo beno, şino seyd. Şino cayên, dereyên; karwanên uja vinderdo.

Laceki karwanî ra pers kert (kerd): -Şima yê çî vinderdê?

Karwanî va: -Arslanên o (Arslanê no) dere di. Ma yê nêwetanîmi **ravêrine!**

Laceki va: -Kotî yo?

Karwanî va: -Eno yo!

Mot a ci. Laceki va:

- Şima duri **kewên!**

Laceki pêşê xo bestî xo mi ra, bazûyê xo **weşarnay, mertalê** xo kerd xo dest a, şemşêrê xo ant, şî **be** arslanî ser. Arslan werişt pay. Arslan û laceki ya pî ya lej kerd. Laceki şemşêrê est be arslanî, kerd dirbetin. Arslanî pencên da be laceki ro, **a** laceki nêkewt, kewt pêşêndê laceki, pêşê laceki dirna. Laceki **fimna** şemşêr

da be arslanî ro, arslan kişt, werte ra kerd di **cay**, karwanî rê va:

-Bêrên, **ravêrên!** Min arslan kişt!

Lacek berma. Karwanî ci ra pers kerd, va:

-Ti çî rê bermenê?

Laceki va: -Arslanî pêşê min dirna, ez **nêwetanan şiran** keye.

Karwanî ci ra pers kerd: -Çî rê nêwetanê şirê keye?

Laceki va: -Ez **şirin** (şiran) keye, piyê min do pêşê minê diratî bivîno; o do vajo "no kê dirnayo?", e do vajan "arslanî dirnayo", o do min bikişo!

Karwan vinderd, jowbînî rê va: -Ma do nê laceki **berime** pêrdê **cey** het. Ma do pêrdê ney ra rica **bikerime, boka** nê laceki rê tebayên nêvajo.

Karwanî lacek girot, bert (berd) pêrdê **cey** het. Lacek rişt kiştî keyî, karwan şî kiştî odî; **hema** şî pêrdê la-

cekî dest, hema kewtî duri, pay vinderdî.

Pêrê laceki karwanî ra pers kerd, va: -Xeyr o şima?

Înan va: -Ma qandê ricayên ameyme to ra ricayên bikerime.

Pêrê laceki va: -**Vajên.**

Karwanî va: -Ma ameyme to ra lacê to rica bikerime.

Pêrê laceki va: -**Vajên.**

Karwanî va: -Ma ray ra **şiyên**, ma vernî de (di) arslanê peyda bi. Ma **nêşa** ra vêrime tersandê arslanî ver. Ma di no lacê to ame, ma ra pers kerd: "şima çî vinderdê?" Ma va "arslanên na ray ser o vinderdo, ma yê nêwetanîme **ravêrime**". Lacê to va "kotî yo?". Ma arslan mot bi ci. Ey û **arslanî*** ya pî ya leş (lej) kerd. Arslanî pencê da be (bi) pêşê laceki jî ro. Laceki şemşêrê da be arslanî ro, arslan kişt. Ma rê va "**ravêrên, min** arslan kişt!"

Ma kerd **ravêrime**, lacek berma. Ma va "ti çî rê bermene?" Ey va "arslanî pêşê min **dirnao (dirnayo)**, ez nêwetanan **şirin** keye".

Ma laceki rê va "çî rê ti nêwetanê şirê keye?" Laceki va "min arslan kişt, arslanî pêşê min dirna, piyê min do min bikişo!" Ma va "çî rê to bikişo?" Ey va "zêra (zîra) arslanî pêşê min dirna, qandê coy nêwetanan şirin." Ma qandê coy ameyme, **tu** do qusurê laceki **afw** ('ef) bikerê. Ma to ra rica kenîme.

Wexto ki karwanî no **pers** pêrdê laceki rê va, pêrê laceki da be xo sare ro, va:

- Heywax! No lacê min niyo.

Înan va: -Çî rê?

Ey va: -Lacê min **biayên** (biyayên) se arslanî pêşê cey **nêdirnayên.**

Karwanî pêrdê laceki rê va: -Çî rê? Pêrê laceki va: -Arslan cinawirên o, çî rê pêşê cey bidirno? **Zanayên** ki do pêşê **cey** arslan bidirno, çî rê şî arslanî ser û çî rê arslanî **dir leş** kerd?

Karwanî va: -Kiştay ma ya no girwe girwêndo gird bi. Herkes nêşeno arslanî bikişo, nê laceki arslan

kişt, nika **tî** yê qahrênê. Ma nê qahardê to rê ma ta'acub kenîme.

Pêrê laceki karwanî rê va kê: - **Hatta** nika 'emirdê min di min çendi arslanî kiştê. Arslanî nêşa mi rê zerarên bikerero. No lacê min o, çî re pêşê cey dirnao? **Zanayên** ki arslan do ey rê zerarên bikerero, wa qet arslanî dir leş **nêkerdên!**

Karwanî pêrdê laceki rê va: -Ti do qusurê laceki 'af ('ef) **kerê.**

Pêrê laceki va: - Qandê xatirdê şima. Şima xerib **î** (ê), min af kert (kerd).

Lacê **cey** ame, destê pêrdê xo lew na pa. Pêrê laceki lacdê (**lajdê**) xo rê va:

- **Mî (Min)** ti dayê **be** xatirdê karwanî.

Ricayê karwanî pêrê laceki qebûl kerd**

* Na kelima no tekst di gege "arslan", gege "arslan" nusiyaya.

** Bewnî: Karl Hadank-Oskar Mann, Mundarten der Zaza Hauptsächlich Aus Siwerek und Kor, Berlin, 1932, r: 195-196

Namey na mesela (Lacek û Aslan) ma pa na.

Welatê de mordemê beno. Ju kî cina xo bena. Cina **na** mordem **zof** înatkare bena. **Rozê** (Rojê) mordemek cina xo ra vano:

-Cinik, mi rê çorva (şorba) poze.

Cinike sona bulxur pozena.

Mordemek vano: -Cinik mi rê bulxur poze.

Cinike sona çorva pozena.

Rozê mordemek cina xo ra vano: -Cinik ez son kolîyon. **Silîye** (Şilî) ke **nêvorê**, qatirê bijê bê ma kolîyon barkeme bîyarme. Xora eke silîye vorê, qatire miya, tu ve xo bê.

Mordemek torjê(torzîn) cêno sono game. Xeylê kolîyon keno hurdî, silîye **kena tiro** vorena. Cayê **olaxe** nêdana. Mordemek nîyadano ke cinike qatire gureta **ûza** (wica) **vejiye(vezîye)**. Mordemek **hên** ke qariyo çatlemis beno, xo keno lete, vano:

-Cinik, mi tu ra va ke "silîye ke vorê, qatire miya." Tu çî (çirê) qatire arde?

Cinike vengê xo nêkena, qatire cêna verê mordemek ra vêrena ra, sona. Mordemek vano:

-Cinik, ûza **de meso, qule** verê tu de esta, **ginena pi** ro.

Cinike qeytan **gos nêdana**, sona, qule ra sona cêr.

Mordemek nîyadano ke cêr o vengê zirçên ame. Xo xo rê vano:

- Na çîqa ke xiravine vo, cina min a. Vinde, ez nayê qule ra **vejîne.**

Mordemek sono **diyarê** qule, **rese** (resne) tiro verdano **ro**, nîyadano ke juye cêr o rese ro oncîno. Deqê tîpiya nîyadano ke **dêvê** qule ra, rese ra oncîya ame ser. Cinike kî ništa ro vilê dêvî, hetê ra kî gosû (goşan) oncena.

Dêv kî hên ke zirçeno, dîna keno letey.

Mordemek **dêv** (dêvî) ra vano: -Aye berze bine, aye berze bine!

Dêv xo saneno (şaneno) ra, cinike tiro erzeno bine û mordemek ra vano:

-Tu ez **aye** ra **xelesnîne**. Biwaze, mi ra çî **wazena** biwaze!

Mordemek vano: - **Pirçê** xo ra hîre mûyon bide mi.

Dêv hîre telonê mûyon dano mordemekî, vano:

-Tu ke na mûy vêsna (veşnay), çî wazena **hênî** (ena, wina) beno. Nîyade, tu ke rêyna (fina, hewna, gilangîna) rastê mi vejiye, tu wen.

Dêv beno **vînd** sono. Mordemek kî telon ra juye vêsno, **sir beno** sono pêyê hot (hewt) kowon de, sukê de vejîno. Zerê sukê de fetelîno, sono verê sarayê de vejîno. Nîyadano ke verê sarayê pêro pirrê qulî yo. Pers keno, vano:

-No çik o, na millet çî **tika** (tiya, ewta) biyo top?

Ci ra vanê: - Çêna pasay biya nêwes(nêweş). Kam ke ci rê dewa diye, pasa çêna xo dano **dey**.

Mordemek sono çêverê sarayîye, eskeron ra vano:

- Şêrê pasay ra vazê (vajê), çêna dey biya nêwes, dewa mi der a.

Eskerî vanê: -**Honde** welaton ra **tavîv** (tebîbî) amey, kesî dewa nêdiyê, tu **kot**(kotî, kura) ra vînena?

Mordemek vano: - Sima şêrê pasay ra vazê.

Eskerî sonê, pasay ra vanê. Pasa vano:

-Wa bêro.

Mordemekî vejenê verê pasay, pasa vano **hal-mezal** (hal-mesela) ni ya. Çêna mi hot asmî yo

biya nêwese, kesî ci rê dewa nêdiye.

Mordemek vano: -Ez çêna tu rê dewa vînen.

Mordemekî benê **oda** çêneke. Mordemek oda ra sarê (şarê) bîni keno tever. Mordemek û çêna pasay tîyna manenê. Mordemek verê **pisa** xo ra mûyê vezeno (vejeno), **fino** ra ci. Duyê mûye dano ra **firna** (pirnika) çêneke. Çêneke bena wes (weş) û war, urzena ra.

Pasa çêna xo dano mordemekî. Çewres **roze**, çewres sewe veyve keno. Mordemek saraya pasay de niseno ro, linge erzeno linge ser, çêfê (kêfê) xo de nîyadano. Dêv kî sono **zovna** welat de kuno firna çêna pasay, çêna pasay bena nêwese, **gîne** cilon ro. Pasa her cayê dîna ra tavîvon ano, qeytan ju ci rê dewa nêvînen. **Fênda** mordemek sona gosê pasayê yî welatî. Pasa xeverê **rusneno** (erşaweno), hawalê xo pasay rê vano:

-Çêna mi biya nêwes. Se **kena** bike, zamayê xo birusne.

Pasa eve zamayê xo sa (şa) beno, zamayê xo rusneno. Zama sono saraya pasay, benê lîyê çêneke. Zama û çêneke ra (çênek a) **tîyna** manenê. Mordemek verê pisa xo ra mûyê vezeno, vêsno, duma dano ra fima çêneke. Dêv ci ra vejîno, mordemek ra vano:

-Mî tu ra va ke "rêyna mi ri ro mevejiye, tu wen!" Çî onca (ançiya) vejîya?

Înatkare

Arêkerdex: Usxan

Mordemek vano: - Ez zone, ama cina mina verêne (virêne) amê, **co** ka ez **remine** amîne na welat. Dêv vano:

- Wêy, cina tu ke hata ûza **ama**, heta tika kî yêna. Ez na welat kî ca va ; ez çik ne, na welat çik o! Na **hard** ('ard) mi rê heram vo!

Dêv ûza kî ca verdano, beno vînd. Mordemek **a** çêneke kî cêno, cêreno ra **yêno** saraya xo, eve di cinon sono reseno murodê (miradê) xo.

vatox: Heyder cayê vatene: Dersim Tarix: 1983

Ay paştîya mi !

Va di tenan da pêro. **Jîn** ra yew **çewdê jê** çînêbi, bêkes bi. Ay bîn qebîla jê zaf bi. **Wexta** jîn wîrdîni da pêro, ayo **gî** qebîla jê zaf bi **bêroyîn**(pêrunî) tê reydi da mîrikê bêkesî ro. Jê tim va:

-Ay paştîya mi!

Ay mîrikanê zafan ra yewî mîrikê bêkesî ra va:

-Teres, ma bêro(pêro) **nimajna** danê qaftê to ro, ma ra çewekî nêdawo paştîya to ro, ti çî rê vanê "ay paştîya mi!"

Mîriko bêkes berma û va:

-Teres ti yî! Eger paştîya min bibîni se şima **nêşaynê** bidê mi ro û ta'da mi bikê. Ez bêkes û bêpaştî ya, **co** ra şima danê mi ro û zilim **bi** min kenê.

Arêkerdax: M. Birîndar

Weşanên Jîna Nû

- Herakleitos
- Na Xumxum a...

Adresa waştîşi:
P. Box: 240 12
750 24 Uppsala/Sweden

Şivan; dengbêjê mezin ê Kurdistan

Prof. Dr. Şakirê Miho

Berî çend rojan di ahenga şevêkê de ku ji bo piştigiriya kovara Medya Guneşî hatibû sazkirin, ez gelek şa û bextewar bûm ku fersend ji min re derket ku careke din guhdariya bi kêrhatîrîn hunermend û dengbêjê Kurd bikim. Ez wek her careke din sermest bûm. Çiqas bi kêrhatîneke mezin a vî mirovê jêhatî heye di berhemên pîr çeşne ê hunermendî de! Bi hîskirinek nazik di hemû awaz û muzîqa Kurdî digihê û reng û rewş û êşa netewe yê wî di hemû awaz û sitranên wî de xuya dikin.

Şivan niştimanperwerekî heqîqî ye, bi his û çarenivîsa miletê xwe re dijî. Hunermendekî bînumîne ye ku sitranên Kurdî diafirîne û pêşkêş dîke. Rojekê pêşmergeyekî ji min re got: Gava heveleki pêşmerge birîndar bûbû, di bin muzîk û sitranên Şivan de emeliyetekek bê tevîzandin kiribû.

Ji mirovekî re gelek bextewariyek mezin e gava ji aliye miletê xwe ve xoşewist û bi rûmet be. Ez dikarim bibêjim ku Şivan û hevaljina wî ya hunermend Gulîstan ciyê rûmet û xoşewistiyê ne ji alî miletê Kurd. Miletê Kurd wê tim sipasî Şivan bike, gava li pey xwe şivanekî nuh bi cih bihêle. Ne dîre ku kurê wî yê ciwan û ruhşîrinê wî wek Şivan derkeve û ciyê wî bigre.

Şivan rûdaneke bê hempa ye ku his û daxwaza neteweyê xwe tîne ziman. Berpirsiyarekê pêwîstiyê li ser her Kurdekî ye ku ihtîrîra Şivan bigre û biparêze, pê xweş be ku wî teqdir bike. Çimkî Şivan layiqî hemû wê rêz û hurmetê ye.

15-11-88 Stockholm

Têkoşîna gelê Kurd...

van her sê cephan de gelo kîjan hêzên "şoresger û demokrat" hene, ku hêzên Kurd, "pût ne dan piştgirî û hevkarîya" wan? Bi dîtina min rexna S. Keya bê bingeh e û ji kompleksa "enternasyonalistiyê" tê. "Enternasyonalistiyek" wisa ku em tim çewt û neheq in û yê hember me jî tim rast û bi heq in.

Di politikayê de ya muhîm pêşniyar e ne şîret e

S. Keya di nivîsa xwe de dibêje: "Tevgera netewî a li Kurdis-

tana Iraqê nebû xwediyê qerekerê netewî demokrat û hevçax" Bi baweriya min van gotinana ji rexne û pêşniyareke ji rewşa îro re bêtir, şîret in û di politikayê de jî ciyê şîretan tune ye. Îro ya rast û hewce ne şîret e; gelsa gelê me pîr konkret e, dibê dîtîn û pêşniyarên me jî li gor wê yekê konkret bin. Ya din çaxa meriv rexnan li xelkê digre dibê meriv hinekî mutewazî û objektîf be. Dema ne wisa be, xelkê jî ji meriv re bibêje, "Heger hûn hewqasî zane û jîr in, çima ariyekê li serê xwe nakin?"

Sergêr û karbidestên xudanqedrê mehname ya Armanç'ê

Digel pêşkêşkirina silavan destên we bi germî digivêsim û mandî nebûnê dibêjimê we. Hêvîdarim li geşandin û weşandina tor û edeba Kurdî da hûn bi ser kevin û çî cara di nav karûbarê jinê da rastî alozî û astengan neyên.

Hevalên delal çavên mi bi Armanç'a jimare 82'ê ket. destên we neêşin û tilpêçikên we nerizin. Bi rastî hûn li derwayî welat gelekî zehmetê dikşînin. Hêvîdarim zehmeta we badîhewa neçe. We gotara min ya li ser Meleyê Cizîrî jî belaw kiriye, zor sipas. Lê xwazî we dest li gote û peyvê wê nedana. Çimkî min ew gotara di kovarek din da dabû we şandin. Eger min ji we re bişanda erê. Bo weşandina gotara ya baş ewe ku nivîsinêd her nivîskerekî bi zarav û gotinên wî nivîskarî bîn weşandin. Daku huner bi zarave û govêr cur bi cur û celeb celebîya zimanê Kurdî nasiyan bin.

Yek jî eger sergêr û karbidestên kovar yan rojnameyekê bizanin gote yan peyvek di gotarekê de hele û çewt û şaş e, erê mafê wan heye şaş hildin û peyvek rast danên dewsa wê peyvê, nekû peyvên rast û dirust rakin û di ciyê wan de goteyêd ne serast û çewt cî bi cî kin. Min gotara li ser Cizîrî bi hûrgilî xwend, we nêzîkî heftê(70) gote û peyvê wê guhestiyê û destvedayî kiriye. Bo nimûne digel wê nivîskerekî hindêk ji wan peyvana ji we re dişînim. Hûn dikarin wana çap û belaw bikin.

Hêvîdar im dilê wergêrê wê gotarê li min nemîne û di karkirinê da jî dilsar nebe.

Birayê we
Pervîz Cîhanî

Dûmahîka nivîsan

Girtî bi grewên birçîbûnê...

Henîfe Takir rakirin nexweşxanê. Di wexta grewê de merivên girtiyan sloganên "Bimre Faşîzm" "Na ji Beyanname l'ê Tebaşê re!" avêtin.

Li Stenbolê di 9'ê Çiriya Paşîn de pîrekek bi navê Xanim Sonmez teşebusê xwe şewitandî kir. Xanim Sonmez rakirin nexweşxanê.

Li Nazîlyê jî 9 kesên girtiyan ji alî polis hatin girtin. Ji ber ku wan tadeyî li girtiyan dibe protestoyê kiribûn.

Di 22'ê Çiriya Paşîn de li bajarê Çanaqelê 30 û di 25'ê Çiriya Paşîn de jî li İzmirê 14 telebe ji ber ku ji Wezîrê Adlî Mehmet Topaç re telgirafên protestoyê şiyandibûn hatin girtin.

Hin abûqatên Baroya Anqerê ji bo ku qerarnama l'ê Tebaşê bê îptal kirin di 22'ê Çiriya Paşîn de li Daniştayê (Mahkema bilind) dewa vekirin.

Li Swêdê jî Komîta 14 Qolî û Komîta TEVGÊR'ê ya Swêd belavokeke ji muese, partî û parlamenterên Swêdê re şiyandin. Wan di belavoka xwe de ji girtiyan re piştgirî xwest in.

Piştî 42 rojên grewa hefsa leşkerî ya Diyarbekrê, girtiyan îcar grewa birçîbûnê veşandî grewa mirinê. Di roja 44 rê grewê de îdara hefsê hinek daxwazên girtiyan qebûl kir. Di dema wê grewê de di hafiza 40 kesî de zeîfûn çêbû. Doktor dibêjin ku, piştî ewqas rojên grewa birçîbûnê wê ge-

lek kes seqet bimînin.

Wexta rojnama me ket çapê di hin hefsan de grewên birçîbûnê hîn dom dikir û li hin hefsan de jî dîsa dest bi grewê kirin.

Şeva Piştigirî...

Sovyetî Prof. Dr. Şakirê Miho Xudoyan jî di şevê de axaftinek kir. Wî li ser xebata Kurdên Yekîtiya Sovyetê guhdaran agahdar kir û serkevîna xebatkarên Medya Guneşî xwest.

Di programa şevê de helbest hatin xwendin û bi slaytê jî rîsmên şexsiyeten Kurda û rîsmên qaxaxên kovarên Kurda ku berî 12'ê Îlonê li Kurdistana Tirkîyê derketibûn hat nîşan dan.

Koma Farqîn û Kulîk şevê dewlemend kirin. Koma Dîlan û Koma Govend jî bi def û zîrnê govendên herêmên kurdistanê pêşkêşî temaşevan kirin û bi wî hawayî reng dan şevê.

Barê şevê li ser milê Şivan û Gulîstan bû. Herdu hunermendên Kurd bi seatan temaşevan anîn eşqê û heyecanê. Şev bi tambûr û dengê Şivan û Gulîstan bi marşa Milî ya Kurda; "Ey Raqîb" qediya.

Çalakiyên pêşmerge...

zên dijmin tevî helikopteran êriş birin ser mufrezeyek pêşmergeyên Germiyana. Di vî şerî de helikopterek dijmin hate xistin. Hêzên pêşmerge bi navê Husên Abdula (Şêrko), Helkewt (muhendîzê cîhaz-têlsîz) û Şêrzand Remezan 3 şehîd dan.

Hêzên Pêşmerge bi grûbên piçûk li gelek herêmên Kurdistanê, li çol û çîyan û li nav bajaran derbeyên giran li dijmin dixin. Lê ji

alî din, dijmin bi çekên kîmyayî barbarî û hovîtiya xwe didomîne.

Di roja 11'ê meha 10'an de navçaya Şêx Bizeynî bi çekên kîmyayî hate bombardûman kirin. Di vî êrişê de 8 hevvelatî şehîd ketin. Dîsa, di 14'ê meha 10'an de 3 balafirên dijmin li navçaya Kerkûkê li hinda Çemê Rêzan bi çekên kîmyayî bobardûman kirin. Di vî êrişê de jî 48 hevvelatî şehîd ketin. □

Jîn (Rojname)

emirnama jêrîn şandîye: "Tiştên ku hatine emîrkin ev in: Name divê bîn sansurkirin. Divê tedbîr bîn sitendin da ku rojnameyên ku behsa Kurdî û Tirkîtiyê dikin, bi taybetî rojnama Jîn'ê negihîje Dêrsim û navçeya Dêrsim'ê."¹⁵

Dr. Abdullah Cewdet jî yek ji nivîskarên rojnama Jîn'ê ye. Li gor Dr. M. Şûkrû Hanioğlû, di hejmara 21 Receb 1338/1920'î ya wê rojnamê de bi navê "Milletler ve İnsanlık" (Millet û Mirovayetî) û di hejmara 32.a wê de jî nivîseke wî ya bi navê "Lutfî Fikrî Bey" heye¹⁶.

Ebada hejmara 36.a rojnama Jîn'ê: 58 X 42 cm. ye. no tarîxa derketinê 36 4 Şewwal 1338/21 Hezîran 1336/21 Hezîran 1920.

Ev nivîs jî nivîsa Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî ya bi navê "Rojnamegeriya Kurdî li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê" hatiye girtin.

1- Jîn (Kürdçe-Türkçe), cild: 1, Wergêr ji tîpên 'Erebî bo tîpên Latînî: M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, r: 9

2- Binêre: Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî, "Rojnamegeriya Kurdî li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê", Çarçira (kovara çandeyî ya giştî), Stockholm, no: 3 (Tebax 1986), r: 14-20

3- Li gor Zinnar Sîlopî hejmara 28.a rojnama Jîn'ê, di 20 Teşrîni Ewrel (1919) de; li gor Muhemmed Emîn Zekî hejmara 32. a wê, Cemaziyel ûla 1338/Çileyayê paşîn 1920'î de derketiye.

Binêre: Sîlopî, Zinnar; Doza Kurdistana, Stewr Basimevi, Beyrut(?), r: 185.

- Zekî, Muhemmed Emîn; Xulasetû Tarîxîl- Kurd we Kurdistana mîn Eqdemîl- 'Usurît- Tarîxiyê Hette'l-An, Wergêr: Muhemmed 'Elî 'Ewnî, cild:1, çapa duduyan, Bexdad, 1961, r: 352

4- Binêre: Bulletin periodique de la presse Turque, no: 4 (Lundî, 10 mai 1920), r: 7

Li gor wê bultenê, di du hejmarên rojnama Jîn'ê (25.3.1920 û 26.3.1920) de, rexne li Seyîd 'Evdilqadir û

Pierre Loti hatiye girtin.

5- Sîlopî, r: 60

6- Sarihana, Zekî; Kurtuluş Savaşı Günlûğü (Mondros'tan Erzurum'a), cild:1, ikincî baskı, Öğretmen Dünyası Yayınları, Ankara, 1982, r: 373

7- Li gor Zinnar Sîlopî kesên ku Kürt Millet Fırkası damezrandine ev in: 1) Necmeddîn Huseyin, 2) Memduh Selîm (yek ji temsîlkarên wê partiyê ye), 3) Kemal Fewzî, 4) Babanzade Azîz Bey (binêre: kitêba Zinnar Sîlopî, Doza Kurdistana, r: 60, 106).

8- Binêre: Bedl, Saîd; Tarîxçeyê Conboşhayê Millîyê Kord ez Qernê Nozdehom ta Payanê Cengê Cîhanê Dovvom, Ez Entesarat û Teblîxatê Hizbê Demokratî Kordestanê Îran der Xaric ez Kêşver, 1363/1984, r: 47

9- Sarihana, cild:3, 1986, r: 82

10- Methy, Daniel; "Birinci Dünya Savaşı Sonrası Constantinople'da Kürt Örgütlenmeleri Üzerine Bazı Belirlemeler", Studia Kurdica, Paris, no: 1-3 (Nisan 1985), r: 45

11- Binêre: Sîlopî, r: 59-60

-Şêrko, Blêç; Kêşey Kurd: Mêjîne w Êstayê Kurd, Muhemmed Heme Baqî kirdûyê be Kurdî, le bilawkirawekanî Yekêtîy Nûseranî Kurdistana, 1986, r: 63

12- Bedl, Saîd; r: 47

13- Sîlopî, r: 60

14- Hemze Begê Muksî (Miksî), hem di komela Hêvîyê de xebitiye hem jî yek ji muessîs (damezrêner) û berpirsiyarên Kürdistan Tealî Cemiyetî bûye. Wî ji kitêba Mem û Zîn'ê (ya ku di 1919'an de li Îstebol'ê çap bûbû) re pêşgotinek nivîsiye. Herweha berpirsiyarê bîst hejmarên pêşîn ên kovara Jîn'ê bûye. Piştî hejmara 20'î-Îhtîmal e ku ji ber girtina wî ya li Mêrdîne-li şûna wî Memduh Selîm bû berpirsiyarê kovara Jîn'ê. Piştî re, di 1925'an de Hemzeyê Muksî dîsa hatiye girtin, deh sal ceza hepsê xwariye û sargûnî Kastamonu'yê bûye (Hesen Hîşyar wê yekê di nivîseke xwe ya çapnebûyî de dinivîse).

Li gor ku Nûreddîn Zaza di biranînen xwe de dinivîse, Hemzeyê Muksî jî ber editoriya kitêba Mem û Zîn'ê ev ceza xwariye (herweha Hesen Hîşyar jî dinivîse dibêje ku wî Mem û Zîn tertîb kiriyê û daye çapkirin).

Dîsa ji nivîsa Nûreddîn Zaza tê fêmkirin ku ew di 1930'yî de li Sûriyê bûye (binêre: Zaza, Nouredine; Ma vie de de Kurde ou le cri du peuple Kurde, Editinos Pierre-Marcel Favre, Lausanne, 1982, r: 71).

Hemzeyê Muksî di 1931'ê de li Şam'ê li gel Celadet Bedirxan di komîsyona amadekirina alfabe ya Kurdî ya bi herfên Latînî de xebitiye (binêre: Sîlopî, r: 164).

Nivîskarê ku bi îmza Nemirê Miksî di kovara Hawarê (no: 6; 8 Tebax 1932) de nivîsiye jî ihtimal e ku Hemze bi xwe be.

Herekol Azizan (Celadet Alî Bedirxan) di hejmara 33.a kovara Hawarê (1.10.1941) de ji bo Hemzeyê Muksî weha dinivîse: "Seyda Hemze îro midirê dibistanên Hesiçê ye." Wekî ku tê zanîn Hesiçê îro di nav sînorên dewleta Sûriyê de ye. Li gor ku Hesen Hîşyar dinivîse, Hemze Begê Muksî li Hesiçê "giyan siparte axa sar...li rojavayê Tirbasipî li Dîgure hatîye veşartin" (Hesen Hîşyar wê yekê di nivîseke xwe ya çapnebûyî de dinivîse).

15- Dersim (gizli ve zata mahsustur), T.C. Dahiliye Vekaleti Jandarma Umum Kumandanlığı, Sayı: 55058, r: 169

16- Hanioğlû, Dr. M. Şûkrû; Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah Cevdet ve Dönemi, İstanbul, 1981, r: 321, 297

Dewleta Filistînê: di têkoşîna gelê Filistînê de qonaxek girîng e

Biryara îlankirina Dewleta Filistînê bi tevayîya dengan hat qebûl kirin. Ji 350 nûnerên Meclîsa Netewî ya Filistînê (MNF) 46 nûner li dijî qebûlkirina biryarên Netewên Yekbûyî (NY) ên 242 û 338'an deng dan. Bi vê biryara MNF'ê biryarên Netewên Yekbûyî ên 242 û 338 jî hate qebûl kirin. Bi vê biryarê RRF (Rêxistîna Rizgariya Filistînê) ê cara yekemîn hebûna Dewleta Îsraîl qebûl kir.

Piştî têkoşînek bi xwîn û xebatek dîrûdirêj roja 15.11. 1988'an li Cezayîrê gelê Filistînê bi seroktiya RRF'ê dewleta xwe ya serbixwe, Dewleta Filistînê îlan kir.

Dewleta Filistînê, ji bil Sûriyê, ji alî hemû dewletên Erebb; Cezayîr, Kuweyt, Erebbîstana Seûdî, Iraq, Urdin, Tûnis, Yemena Başûr, Yemena Bajûr, Mîrîyên Erebbî yên Yekbûyî, Qeter, Bahreyn, Misir û Fas hat nas kirin. Tirkiyê, Pakîstan, Hindîstan, Çîn, DDR, Yוגoslavîya, Bangladeş, Maleziya, Madagaskar û Îndonezya jî dewleta Filistînê nas kirin. Wisa xuya ye wê hejmarê dewletên ku Dewleta Filistînê Nas bikin roj bi roj zêde bibe.

Piştî îlankirina Dewleta Filistînê, Yaser Arafat li preskonferansa pêkhatî hêvî û gazinên xwe ji welatên Ewrûpî û bi taybetî jî ji DAY bi van bêjeyên jêrîn anî zimên: "Em aşîxwaz in. Aşîtiya ku tê xwestin divê bi bingeha wekhevîyê bête pêkanîn. dewleta îlankirî mafê me ye herî hîmî ye. Divê ji niha û pê ve welatên Ewrûpî di tevgera aşîtiyê ya li Rojhilata Navîn de berpirsiyarê xwe bi cîh bînin. Di daxwazname me de hemû pîvan û rastî û nermîtiyên ku ji me dihatin xwestin hene, îcar dor dora DAY ye. Em aşîtiyê pars nakin. Em bi hemû terefên ku tevî vê pirsgirêkê bûne, bi şertên

wekhev, dixwazin aşîtiyê pêkbînin."

Di îlana Dewleta Filistînê de tiştê herî nuh û balkêş qebûlkirina biryarên NY ên hejmarê 242'an û 338'an e. Bi vê biryarê RRF cara yekemîn bi awakî resmî Dewleta Îsraîl nas dike. Wek tê zanîn ev herdu biryarên NY di helkirina pîrsa Rojhilata Navîn û bi taybetî jî pîrsa gelê Filistînê de kevirên hîmî ne. Herdu biryar jî garantiya jiyana di nav sînorên naskirî û ewleyî yên hemû dewletên li Rojhilata Navîn dide. Ev tê wê manê ku MNF, Dewleta Îsraîl ne raste rast lê bi qebûlkirina biryarên 242 û 338 nas dike. Bi vê qebûlkirinê wê RRF di hemû statûyan de wek nimînendeyê gelê Filistînê bikeve civînen navnetewî.

Gelo sebêbên îlankirina dewleta Filistînê û qebûlkirina biryarên hejmarê 242 û 338 çi bûn? MNF çima van biryara stend?

A yekemîn; serhildana gelê filistînê ya li herêmên dagirkirî ye. serhildana gelê Filistînê li Gaza û li Şerîayê heya niha 300 şehîd da. Xelk bi kevir û çoyan li berxwe didin. daxwaza gelê herêmên dagirkirî rojek zûtir helkirina pîrsa gelê Filistînê ye. Eşkere ye ku ev gel berxwedana xwe heya dawiyê bi kevir û çoyan nikare bîdomîne. Îhtîmalek mezin

ew e ku rewşa Gaza û Şerîayê zor da RRF'ê ku biryareke wiha bistîne.

A duyemîn; rewşa navnetewî ye. Îro ji her demê bêtiş gelê dinê bal û giraniya xwe daye ser helkirina pîrsa Rojhilata Navîn. Heya niha welatên Ewrûpî û bi taybetî DAY jî RRF'ê daxwaz dikirin ku hebûna Îsraîl qebûl bike. Bi qebûlkirina biryarên hejmarê 242 û 338'an ev bend ji holê rabû û pêkanîna civîneke navnetewî wê hêsantir bibe. RRF wê bi hemû statûyan di civîneke wiha de gelê xwe temsîl bike, biparêze. Nemaze yekîtiya nav RRF'ê, di vê babatê de wê rolek mezin bileyze.

A sêyemîn; ihtîmalek mezin e ku welatên Ewrûpî û bi taybetî DAY-bi şertê ku RRF bête naskirin- zaftir zor bidîne Îsraîl daku ji erdên Filistînê derkeve û helkirina pîrsa gelê Filistînê de şêlek pozîtîf bistîne.

Serokê DAY yê nuh George Bush di beyana xwe de kêfxweşîya xwe ji bo qebûlkirina 242 û 338'an anî lê belê wek her demê jî xwe re hin sebêbên din derxistin.

DAY berê beyan kiribû ku RRF biryarên 242 û 338'an qebûl bike ew jî wê RRF nas bike. Îro ev bûye rastîyek. Lê xuyaye Gerge Bush û hevalbendên wî ji bo ne naskirina RRF'ê wê hin bahaneyên din derxin holê.



Yaser Arafat
'Di destekî me de guliyê zeytûnê û di destekî me de jî kevir heye'. Guliyê zeytûnê biryara îlankirina Dewleta Filistînê ye û kevir jî di berxwedana gelê Filistînê de domandina bi biryarbûn û tekûzbûnê ye.

Helbet bi îlankirina Dewleta Filistînê pîrsa gelê Filistînê hel nabe. Dewleta Filistîn di helkirina pîrsê de qonaxek nuh e. Hê di pêş gelê Filistînê û RRF'ê de rêke dîr û dirêj heye. Hêvî ew e ku xwînrijandin bila ji holê rabe, lê belê daxwaziyeke wiha ji alî insanî ve rastîyek e. Têkoşîna gelê Filistînê heya niha gelek şehîd da û piştî vê qonaxa nuh jî wê şehîdan bide.

Gelê Filistînê wê hukûmeta xwe damezrîne û dest bi karûbarên xwe yên dîplomatîk bike. Di vî karûbarî de Yaser Arafat got: "Di destekî me de guliyê zeytûnê û di destekî me de jî kevir heye". Guliyê zeytûnê biryara îlankirina Dewleta Filistînê ye û kevir jî di berxwedana gelê Filistînê de domandina bi biryarbûn û tekûzbûnê ye. Niha di pêş RRF'ê de vataniya herî girîng bi serkeftina karûbarên dîplomatîkî ye. hejmarê dewletên ku Dewleta Filistînê nas dikin çiqas zêde bibe zora li ser Îsraîl û DAY wê zêdetir bibe.

Bi kurtayî dîrok

Dewleta Filistînê di erdekî 5770 km2 mezin de dê pêk bê. Niha li vê herêmê nêzî 1,5 milyon Filistînî dijîn.

Ji bilî vê nêzî 2,5 milyon Filistînî li derê welatê xwe ne.

Biryara bi cîhbûna Yahûdiyan li Filistînê di sala 1897'an de li konferansa Siyonîstan li Basalê hat girtin. Di sala 1907'an de Wezîrê Derve yê Brîtanya Arthur James Balfour soz da serokê Siyonîstan Lord Ratschild ku di damezrandina dewletek jî bo Yahûdiyan de wê alîkarî bike. Di sala 1915'an de Brîtanya soz da Şerîfê Mekke Huseyîn ku di afirandina Dewleta Erebb a Mezin de wê alîkariya wî bike. Di sala 1916'an de bi peymanê Sykes-Picot Brîtaniya û Fransa Rojhilata Navîn di nav xwe de parve kirin. Ji ber vê yekê jî sozên ku Brîtaniya dabû Siyonîstan û Şerîf Huseyîn têk çûn. Lê belê deklarasîyona Balfour ketibû nav biryarên Koma Miletan û ji ber vê yekê jî Yahûdiyan roj bi roj berê xwe didan Filistînê û koçkirina wan di salên 1930'yî de zêdetir bû. Piştî qetliama Yahûdiyan a ku bi destê Hîtlerê faşîst pêkhat, di sala 1945'an de Yahûdiyên mayîn tevde berê xwe dan Filistînê. Koma Miletan di roja 29'ê Çiriya Paşin a 1947'an de biryara perçekirina Filistînê da. Erebban ev biryara qebûl nekir lê Yahûdiyan qebûl kir. Di roja

14'ê Gulana 1984'an de Dewleta Îsraîl hat îlankirin. Siyonîstan ji delva ku ji qetliamên nazîstan dersan derxin, wan bi xwe dest bi qetilkirina gelê Filistînê kirin. Ji bo rawestandina Siyonîstan pênc dewletên Erebb hêzên xwe kirin yek û êriş dan ser Siyonîstan. Îsraîl di vî şerî de biserket. Nêzî 450.000-600 000 Filistînî welatê xwe terk kirin û hewmecal dîtin ku vegezin welatê xwe.

Di sala 1967'an de Îsraîl êriş da ser herêmên Gaza û Şerîaya Rojava û herdu herêm jî îşxal kirin.

Di sala 1964'an de li kahîreyê ji alî Yekîtiya Erebban RRF hat damezrandin. Ji roja damezrandina xwe heya 1970'ê RRF di afirandina rêxistinêk bi rêk û pêk de gavên pîrr baş avêt. Wiha bû ku Qral Huseyîn ji hukûmê RRF tirsîya û Îlona sala 1970'ê yî êriş da ser. Nêzî 10.000 Filistînî hatin kuştin û RRF jî ji Urdinê hat qewirandin. RRF hemû hêzên xwe kişand Lubnanê. Sala 1982'an Îsraîl êriş da ser kampên Filistînî yên li Lubnanê. RRF mecbûr ma terka Lubnanê jî kir. Lê belê gav bi gav leşkerên xwe paşde şiyand û li Lubnanê bi cîh kir.

Hesen Mizgîn

Fîşa abonetiya Armancê

- Salek
- Şeş Meh

Abonetiya salekî
120 Skr. 120 FF. 20 \$ 35 DM

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgîroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşê jorîn dagirin li ser adresa jêrîn ji me re bişînin.

Adres: P.R S-172 06 Sundbyberg/Sweden